


## Beriya 3'yê Tebaxê û piştî 3'ê Tebaxê

Heya civakên veder ên li derveyî pergala serdestan dijîn, ji bo heyîna xwe; hewla wan bi lez nebe, lebata wan çênebe, ne xwediyê gotin û biryarên xwe bin dê stûye wan her li ber mîrkûtê serdest û zaliman be ... ***Adar Şaman / R.2***



## Sînema ne ji ruhê gel be bê feyde ye

Li vir jî erkê li ser milên sînemavanên kurd ew e ku li dijî vê rûreşiya rêjîmên faşîst şer bikin. Divê sînema û fîlmên kurdî, wekî şerê çekdarî doza azadiyê û xebata gelê kurd bikin. Li ser vê yekê, çi qasî dijmin ji karê min aciz be... ***Hevpeyvîn Evîn Hesen / R.4***



## Xwebûn: Xwenasîn û vegera cewherê

Di hemû serdemên dîrokê de kesayet û pergalên desthilatdar hatine dîtin. Bêguman şêwaz û asta erîşên pergala heyî li gor demê guheriye. Lê bi misogerî dikarim bibêjim ku di her serdeman de êrîşên herî dijwar li ser nirx û cewherê... ***Roja Welat / R.2***

# xwebûn

2-8 TEBAX 2021 HEJMAR:85 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Êdî em ne êzidiyên fermanan e

Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê beriya salvegera fermanê kongreya xwe pêk anî. Cîgirê Hevserokê Meclisê Heso Brahîm diyar kir ku ji ber bê rêxistin û bê parastin bûn bi fermanan re rû bi rû man û wiha got: "Em êzidî xwedî hêz û rêxistin in. Em ne ew êzidiyên berî 2014'an in. Meclis dê bibe meclisa hesabxwestina pêvajoya beriya ... ***R.7***



## Ne hikûmet e DAIŞ e

Emîne Şenyaşar û kurê xwe 146 roj in li edaletê digerin. Heta niha Malbata Şenyaşar serî li gelek partiyên siyasî û rêxistinên civakî da. Dîsa heta niha gelek partî, rêxistin û saziyên civakî çûn Rihayê û piştgirî dan malbata Şenyaşar. Serdanên piştgiriyê yên ji bo malbata Şenyaşar didomin. Emîne Şenyaşar û kurê xwe Ferît, li gel hewaya germ a havînê û nexweşiyên xwe têkoşîn û lêgerîna edaletê didomînin. Emîne Şenyaşar têkildarî têkoşîna "Nobeta edaletê" ku 5 meh in li ber deriyê Dadgeha Rihayê didomîne ji Rojnameya Xwebûnê re axivî û behsa têkoşîna xwe kir... ***Sibel Sutpak/Emrullah Acar / R.3***

## PDK û tesfiyekirina serokên kurd

Ji destpêka damezirandina Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û heta îro, ev partî li ser bingeha tesfiyekirina her rikberekî yan tevgereke kurdî ku ji siyaseta wê nerazî ne, bi hevkariya ajandayên derve, nemaze dewleta tirk û Amerîkayê xwe dide jiyîn, da ku li ser desthilatdariyê bimînin. Dema ku em li zindanên başûr mêze dikin, em dibînin ku bi sedan siyasetmedarên dijber di zindanan de ne. Her wiha nahêlin ku siyasetmedarên ji derveyî herêmê yên li herêmê dimînin çalakiyên xwe yên siyasî bidin meşandin.Di dirêjahiya dîrokê de û heya îro, PDK'ê tevgerên Kurd û hemî... ***Serdem Silo / R.6***

## Kurdên cîhana dêrîn: hattî-hîtîtî 2

Serê sibê zû, berî roj hilê em radibin xurîniya xwe dikin û em berê xwe didin Hattûşaya efsanewî ya navgiran (nola dibêjin: "Nav ê giran e, war ê wêran e.) Em di deriyê hêla rojava re, daxilî nava bajêr dibin. Pencê roja nûhilatî jî ji hêla deriyê şêr ve diavêje der. Tîrêjên rojê, mîna teriya teyrê tawis li ser kavilê Hattûşayê belav dibe û me bi silava Xwedawenda rojê ya Arînayê silav dike. Paytext Hattûşa, li ber paleke bilind e û 4 km li rojhilatê navçeya Bogazkaleya Çorûmê dikeve. Her wiha li ser 40 hektar erdî hatiye avakirin.. ***Agît Yazar / R.12***

## Mirov bê azadî, azadî bê zanebûn nabe!

Îro em di pêvajoyeke pir zor û girîng re derbas dibin. Gelek tişt ser û binê hev bibin jî wêje û huner tu caran ranaweste û her dem rola xwe dilîze û dijî xerabiyê serî hildide. Albert Camus dibêje: "Wêje bi tena serê xwe serîhildan e!" Gelo roman, çîrok û helbest nebûna, halê cîhanê wê çawa bûya? Qirêjî û tarîtiya dinyayê ancax bi wêje, huner û zanistiya estetîkê wê paqij bibe. Wêje zilma zordestiyê bi peyv û hêvokên xwe ve bela wela dike. Lê gotinek heye ku dibêjin: "Nivîskar hene, tarîtiyê ronî dikin, nivîskar hene roniyê tarî dikin". Em karin lê zêde bikin, nivîskar hene li defê dixin, nivîskar hene bêdeng di hêlîna xwebûnê de bi eşq û bengîtiyê dinivîsîn. Ali Husein Kerim jî yek ji wan nivîskarên bêdeng e. Lê heta niha bi riya gelek pirtûkên xwe kedeke mezin daye ziman û wêjeya kurdî. Ji bo lîsansa xwe... ***Elif Gun / R.5***



## Estbîyayîşê kurdan rê tehamul nêkenê hişt

Hêrîşê qirkerdişî yê vera kurdan di sê û pancês serrî yo verdewam keno. Komara tirkî ya ke 98 serrî verê cû ser hişmendîya Îtîhat Terakî ameye awankerdiş, wazena vîşêrê nasname û etnîsîteyê tirkîtî nasname û etnîsîteyê bînan heminan çinê bikera. Wexto ke dewleta osmanî kewte serdemê qelsbîyayîş û têkşîyayîşî herinda ke vernîya têkşîyayîş û çinêbîyayîşê xo bigêra sere de bi projeyê 'Îttîhad-i Anasir' waşt bi tay ray û raybazanê dayîşê tay heqanê civakî heme şaran, heme nasname, heme civakan û heme bawerîyan binê sêwanê osmanîyan de verdê û înan rê rayberî bikero. La qederêk badê cû vîna ke serkewtişê nê projeyî mumkun nîyo. Şaro ke bi serran binê bindestîya osmanîyan de cuya bî, seba... ***Mehmet Şahîn / R.9***

HAŞTÎVAN BERKEL

## Gundikê Dono 'romaneke çîrokî'...

***R.11***

## Tirkiye penaberan wekî çekekê bi kar tîne

Ji ber rewşa xwe ya jeopolîtîk Tirkiye di gelek mijaran de xwedî awantejeke girîng e. Rêvebiriya Enqereyê di mijara penaberan de vê avantaja heyî li dijî welatên rojavayî wek çekekê bi kar tîne. Li gor daneyên fermî yên Rêxistina Koçê ya Navneteweyî di sala 2020'î de welata ku herî zêde penaber lê hene Tirkiye ye. Di van çend salên dawî de ji ber êrîşên DAIŞ û bêîstiqrariya heyî ji Sûriye û Iraqê bi milyonan... ***Felemez ulug / R.6***



## Kerê te pîr e

Zilamek ji xwe re li kerekî digere ku ji xwe re bikire. Diçe navçeyeke Amedê, vir de û wê de dipirse. Gelo kerê firotinê li vir hene an na? Mirovek jê re dibêje kerek li filan derê heye... ***Riza Uyar / R.10***

## Her tim berxwedan bi ser ketiye

Bi sedan sal in Kurdistan tê parçekirin. Sînoran mayin dikin û dîwaran li ser sînoran lê dikin. Lê kurd sînoran nas nakin û her tim li dijî sînoran li ber xwe didin. Dîrok nîşan dide ku her tim berxwedan bi ser ketiye. Bi sedan sal in bê navber Kurdistanê parçe dikin. Bi peymana Qesrî Şîrîn a 1639'an Kurdistan kirin 2 parçe. Bi peymana Lozanê ya 1923'an Kurdistan kirin 4 parçe. Sînor di nava malbatan de ava kirin û malbat parçe kirin. Li herêmê, Nisêbîn-Qamişlo, Cizîrî, Qoser, Serêkaniyê, Pirsûs malbat hatin parçekirin. Malbat li binxet û serxet hatin hiştin û ji hev hatin qutkirin. Kurdên hatin parçekirin, meriv, xizm û nasên hev bûn. Mayin û astengî nas nekirin û dîsa çûn û hatin. Gelek birîndar bûn. Gelek seqet man. Lê dîsa çûn û hatin. Têkiliyên xwe... ***R.8***

# DAIŞ'ê radestî edaleta jinên êzidî bikin

Cihê ku şerê têkoşîna azadiyê lê hebe, li wir bihêzbûn, xweparastin, wêrektî û jiyana sazûmanî heye. Cihê ku jinên azad û şerker lê be, li wir xeyalên jîn û jiyanê yê mezin hene. Kesên li pey azadiyê ne, neçar in ku şerê rizgariyê bikin



Adar Şaman

Heya civakên veder ên li derveyî pergala serdestan dijîn, ji bo heyîna xwe; hewla wan bi lez nebe, lebata wan çênebe, ne xwediyê gotin û biryarên xwe bin dê stûye wan her li ber mîrkûtê zaliman be.

Cihê ku şerê têkoşîna azadiyê lê hebe, li wir bihêzbûn, xweparastin û jiyana sazûmanî heye. Cihê ku jinên azad û şerker lê be, li wir xeyalê jiyanê yê mezin hene. Lê di pergala baviksalariyê de jin, weke bela tê dîtin. Ev encama nêzîkatiya zilamê serdest e. Kesên li pey azadiyê ne, neçar in şerê rizgariyê bikin.

3'yê Tebaxê ne roja şînê ye ku herkes rûnê û rondikan bibarîne. 3'yê Tebaxê roja dahûrandin, ezmûn girtin, pêşdebirina erkên xwe, debirîna zanebûnê û rakirina tola fermanê ye. Roj roja ji nû ve avakirina parêzgeha Şingalê ye. Plangeriya fermanê, bi hevkariya îstîxbaratên hêzên hegemon ên cîhanê re hat gerandin. Armanc jê ew bû ku Şingal ji baweriya êzdayetiyê bê xalîkirin û îslama tundrew li ser tevahiya ferdên ji baweriya êzdayetiyê ne, bê ferzkirin; qirkirina çandî û fîzîkî bi hev re bi encam bikin. Lê li pêş hovîtiya reş a rûpoşên nehs-cinawir ên pergala neolîberal; 12 hewariyên serdemê bi eşq û evîna Edûlê, li pêş wan bûne şûr û mertalê Derwêşê Evdî.

Beriya hovîtiya DAIŞ'ê, êvara 3'ê Tebaxê li seranserî gund, bajarok, deşt û çiyayê Şingalê bêdengiya xewa şirîn serwer bû. Herkes di nav hewldana debara mal û malbata xwe de tevdigeriya. Çolistana wîlayeta Nînovayê ji kela kela germa havînê bi pêt û agir bû. Her ku kêliyên man û nemanê nezîk dibûn, lîstika zarokên gundê Koço mezintir dibû. Fermana destpêke li gundê Koço pêk hat. Wê şevê li gundê Koçoyê dawet digeriya, li çar kenarê dawetê zarok bi lîstika xwe mijûl bûn. Komkujiya yekemîn li ser gundê Koço ku piraniya şêniyên wê ji êzidiyan pêk dihat, bi destê cîranên wan ên ereb hat kirin.




Hêzên serdest ên Rojhilata Navîn û mêtîngerên Kurdistanê, di serî de persan 7, osmaniyan 51, bi giştî 74 ferman, di dîrokên cuda de li beramberî baweriya êzdayetiyê pêk hatiye. Armanca fermanên ku hêzên mêtînger pêk anîn ew bû ku heyîn, baweriya vê civaka qedîm a Êzdayî, bi awayê fîzîkî û çandî ji holê bê rakirin. Piraniya fermanan li Şingalê, li ser xaka pîroz qewimîn. Plan valakirina êzidiyan ji Şingalê bû; lê  ev hesabê wan pêk nehat. Heyanî ku Şingal hebe, wê alaya êzdayetiyê ya berxwedanê li lûtkeyê her li ba be.

Dermanê êş û azarê Fermana 3'yê Tebaxa sala 2014'an, qebûlkirina statûya Şingalê ye. Ji bo wê kar û xebat dikeve ser tevahî partî, rêxistinên kurd û her kesek ji me. Heya Şingal statûya xwe bi dest nexe û xwe bi xwe bi rê ve nebe, wê herdem xeteriya êrîş û qirkirine li ser êzidiyan kêm nebe. Wer xuya ye ku civaka êzidî, piştî jenosîda 3'yê Tebaxê bi ezmûn tevdigere û dixebite. Rêveberiya Xweser a Şingalê, di demeke kin de, kar û xebatên xwe lezandin, saziyên civakî yên demokratîk ên aborî, meclisên taxan, gund û bajaran hatin avakirin. Her wiha têkiliyên dîplomatîk di serî de bi hikûmeta navendî ya Iraqê û di asta saziyên navneteweyî de pêş xistin. Hêzên parastina civaka êzidxanê hatin damezirandin, bi hezaran malbatên di fermana 3'yê Tebaxê ji Şingalê koçber bûbûn vegeriyan ser gundewarên xwe û hwd. kar û xebat piralî hatin meşandin.

Jinên êzidî bi nêzikbûna salvegera Fermana 3'yê Tebaxê ku bi hezaran jin û zarok hatibûn revandin û bi komî hatibûn qetilkirin; zêdetir girîngiyê didin erka xweparastinê. Jinên êzidî; hebûna xwe di rêxistina xweser û parastina rewa de dibînin. Lê belê jinên bihêz dikarin bi karê şoreşê re rabin û alîkariyê bikin. Êdî jinên êzidî, xwe bi xwe dikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin û birînên xwe derman bikin. Loma ketina ferq û zanebûna hêza xwe ya cewherî. Her jinek êzidî ya ku xwe bi rêxistin kiriye; di zanabûna parastina xwe û civaka xwe de ye. Ev hişmendî beriya fermana 3'yê Tebaxê lawaz bû, ne birêxistinkirî bû bi qirkirina sedsala 21'emîn a hovane re rû bi rû ma. Ger ku jin xwe zana û rêxistin nekin, dê nikaribin xwe di rêveberiya xweser de mayînde bikin. Ev yek bi têkoşînê dikare bê derbaskirin. Li dijî paşverûtiya baviksalarî û pergala serdest, pêwîst bi ruhê kolektîf ê hest û hêza jinan heye. Jin ewqasî di hêla civakbûyîn, aborî, artêşbûyîn û siyasî de hatiye dûrkirin û çewisandin; êdî dem ew dem e ku ji fermanan ders bên derxistin.

Ne dema lawazî û parçebûnê ye. Dema yekitî û hevgirtina civaka êzidiyan e. Rêgeza ku civaka mirovahiyê pê girêdayî ye, asta zanist, rêxistinkirin û asta wê ya têkiliyên bi hev re ye. Em dikarin bibêjin ku jin pir rehet dikare vê astê ava bike, rêxistinbûna civakê hîn mezintir bike. Ji bo vê jî hişmendiyek wekhev û demokratîk a şoreşger pêwîst e. Divê derveyî van tiştek din layîqî berxwedana Şingalê neyê dîtin û neyê qebûlkirin. Rêgeza vê yeke jî diyar e; divê xweseriya Şingalê misoger bibe, ev bivê nevê ye, rê li ber qirkirin, ferman û komkujiyan bê girtin.



## Rêwitiya li çiyayan

Bi sebir û dîrayeteke mezin, li navsera çiyayê Şingalê, rê vekirin, zarok hilgirtin, ji bo extiyar û nexweşan av û nan peyda kirin, birînên birîndaran dermankirin û ew gihandin deverên ewle. Zanebûn, werektî, ezmûn, hêrsa tolhildanê, li ba wan çi hebû bêyî ku dudiliyê bikin bi vê civakê re parve kirin. Di roja ewil a hawarê de bûne yek ji endamê vê civakê ya hatibû tehcîrkirin. Rewş her ku diçû kembaxtir dibû; jin, zarok û extiyar ji kela germa havînê bêzar, ji têhna bêhn çikiyayî bûbûn. Êdî çongê extiyaran bedena wan ranedikir. Dê û weled ji ber hev winda dibûn.



## Birêxistinbûna jinan

Di jinûveavakirina binesaziya Şingalê de, jinên êzidî bi erka pêşengiyê rabûn. Jinan xwe ji tu zor û zehmetiyan venedan. Jinên êzidî, bi hêrsa dijî fermanê asta hêza xwe ya rêxistina xweser berfireh kirin, xwe perwerde û zana kirin. Îro, vîna herî polîtîk û rêxistinkirî ya Şingalê jin in. Jin, li tevahiya saziyên rêveberiya xweser a demokratîk de xwedî biryar û gotin in. Rengê jinan di kar û xebatên siyasî, civakî, dîplomasî, parastin û avakirinê de diyar e. Jinên êzidî bi baweriya ji hêza xwe ya rêxistinkirî, wiha bi lêv dikin: " DAIŞ'ê teslîmî jinên êzidî bikin; bila jinên êzidî DAIŞ'ê bidarizînin!"  Êdî; ne jinên êzidî ne jî civaka êzidxanê, ne êzidiyên berê ne.

# Xwebûn: Xwenasîn û vegera cewherê

Roja Welat

Di hemû serdemên dîrokê de kesayet û pergalên desthilatdar hatine dîtin. Bêguman şêwaz û asta erîşên pergala heyî li gor demê hatine guherandin. Lê bi misogerî dikarim bibejim ku di her serdeman de êrîşên herî dijwar li ser nirx û cewherê mirovan hatiye kirin.

Bêguman xalên ku weke nirx em pênase dikin pîvan, wijdan-exlaq, çand, cewherê mirovan û hwd. di nav van xalan de cih digirin. Dema ku em qala êrîşên pergalê dikin ji dema sumeran bigire heya pêvajoya feodalîteyê -ku weke dema axa û began tê nasîn- heya sala 2021'ê -ku pergala kapîtalîst herî zêde xwedî bandor e- di bîr û baweriya civakan de xitimandin her wiha di rizandinê de roleke sereke dilîze.

Dema ku em van nirxandinan dikin pêwîst e mijara 'xwebûn' çi ye ango şîroveyeke çawa mirov dikare mijara xwebûnê şênber fam bike-bide fam kirin girîngiyeke xwe ya jêneveger heye. Xwebûn çi ye? Gelo em xwe nas dikin? Gelo em li gor xwezaya xwe tevdigerin an jî em çiqas bi vîna xwe tevdigerin? Destpêkê pirsên wiha ji xwe pirs bikin û yek bi yek bêyî ku hûn xwe bixapînin bersiva van pirsan bidin? Ez bawer im em bihevre bersiv bidin wê hîn zêdetir bi encam be.

Xwebûn: Bûyîna xwe, ango ayîdêxwebûyîn e. Xwe naskirin xwe zanîn ango ji kesayet û fikra teqlîdê vegera cewhera xwe ye. Di jiyana mirovan de ya ku wan her tim li ser pêyan bigire, bike xwedî hêz, xwedî biryar, piştî mirina xwe jî berhemekî mayinde bihêle zanîna mirov e.

Zanayê mezin di nirxandinekî de wiha tine ziman: "Zarok heya 12- 13 saliya xwe fîlozofên deme ne." Ji vê nirxandinê mirov fam dike ku di van temenan de ji ber ku bi temamî ketina nava pergalê  pêş neketiye ji xwebûna xwe dûrketin derneketiye holê, di heman demê de ji zanistên nû re vekirî ne. Tevahiya heyber û heyînên di xwezayê de ji wê/wî re nû tên û hewldanê fêrbûyînê di asteke jor de ye. Fêrbûyîna axaftinê ji bo zarokan keşfeke nû ye û di buhayê parçekirina atomê de ye.

Zanebûn an jî fêrbûyîn pêwîst e ji bo hemû mirovên di buhaya azwerî û eşqekê de bin û mîna tî-birçiyê av û xwarinê bin, birçiyê zanistê bin. Yan em ê xwe nas bikin û zana bin an jî em ê bi rizîn-tunebûnê re rû bi rû bimînin.



Mixabin di roja îro de, bi taybetî li ser ciwanên kurd û jinan, êrîşên pergala kapîtalîst li ser hemû civakê tê meşandin. Ji ziman, nasname, netewe, raman, welat, vîn û girêdayînê ev ji xwebûna xwe dûrdikevin û di nava pergalê de tên bişaftin. Xeyal, lêgerîn û daxwazên ciwanan tên asta tunebûnê.

Dema ev hatin tunekirin di heman demê de mirov bi xwe tune dibe. Êdî tenê dibe miriyek li ser lingan. Xala herî girîng di vir de nifşên pêşerojê zarok û ciwan in.  Weke dayik û bav, xwişk û bira ango civak çiqas nirx bidin perwerdeya wan wê pêşeroja me hin bi îstîqrar û misogertir be. Ji bo vê xala sereke were pêkanîn, xwe ji nav pençên pergalê rizgar kirin, kesayet, civak, dîrok û çanda xwe naskirin e.

Yê ku xwe ava neke nikare kesên din jî ava bike. Hevrêya/ê destpêkê hûn bi xwe ne. Bibin yê xwe,  bibin yê gelê xwe û welatê xwe. Welat bi ruh û mejiyê azad re ava dibe.

# ‘Ne hikûmet e, DAIŞ e’

Emîne Şenyaşar û kurê xwe 146 roj in li edaletê digerin. Heta niha malbatê serdana gelek rêxistin û saziyan kir. Gelek nûneran jî serdana malbatê kirin û piştgirî danê. Lê heta niha daxwaza wê ya edaletê pêk nehatiye. Şenyaşar bi biryar e edaletê pêk bîne

Sibel Sutpak/Emrullah Acar




Emîne Şenyaşar û kurê xwe Ferît Şenyaşar ji bo kujer bên darizandin û hesab ji wan bê pirsîn, 146 roj in têdikoşin. Emîne Şenyaşar, anî ziman ku bi serdana partiyên siyasî û rêxistinên civakî gelek hêzê digire û wiha got: "Heta kurê min neyê berdan û kujer neyên cezakirin ez dest ji vê nobetê bernadim. Ev ne hikûmet e. Ev DAIŞ e. DAIŞ ji wan çêtir e.”

Li navçeya Pirsûsê ya Rihayê beriya hilbijartina giştî ya di 24’ê Hezîrana 2018’an de di 14’ê hezîranê de xizm û alîgirên parlamenterê AKP’ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz li kargeha Malbata Şenyaşar û heta ber Nexweşxaneya Dewletê ya Pirsûsê êrîşî ferdên malbatê kiribû. Di êrîşê de ji heman malbatê Hacî Esvet Şenyaşar û lawên wî Celal û Adil qetil kirin. Di bûyerê de birayê Yildiz ê AKP’yî jî hat kuştin. Fadil Şenyaşar jî birîndar bûbû û sê sal in girtî ye. Zêdeyî 3 sal di ser êrîşa li dijî Malbata Şenyaşar re derbas bûn. Lê hêj kujer nehatine darizandin. Emîne Şenyaşar û lawê xwe Ferît ji bo edalet pêk bê 146 roj in li ber Dadgeha Rihayê “Nobeta Edaletê” digirin. Di van 5 mehan de gelek caran polîsan ew binçav kirin û dîsa serbest berdan.

Heta niha Malbata Şenyaşar serî li gelek partiyên siyasî û rêxistinên civakî da. Dîsa heta niha gelek partî, rêxistin û saziyên civakî çûn Rihayê û piştgirî dan malbata Şenyaşar. Serdanên piştgiriyê yên ji bo malbata Şenyaşar didomin. Emîne Şenyaşar û kurê xwe Ferît, li gel hewaya germ a havînê û nexweşiyên xwe têkoşîn û lêgerîna edaletê didomînin. Emîne Şenyaşar têkildarî têkoşîna “Nobeta edaletê” ya 5 meh in li ber deriyê Dadgeha Rihayê didomîne ji Rojnameya Xwebûnê re axivî.

**Kujer li Rihayê serbest digerin**

Emîne Şenyaşar anî ziman ku ji bo kurê wê yê girtî serbest bê berdan û hesab ji kujerên malbatê bê pirsîn dest bi çalakiya rûniştinê kiriye û wiha got: “Malbata min tev xelas kirin. Kurekî min jî girtî ye. Em dixwazin kurê min bê berdan. Kesên zarok û hevjînê min kuştin serbest li Riha û Pirsûsê digerin. Kurê min kirine odeyekê. Nêzî 4 sal in bi tenê di odeyekê de girtî ye. Edalet tune ye. Em bi pey şopa edaletê ketine. Hundirê avahiya edaletê li me qedexe kirine. Dozger me di qewitîne. Em li hundirê avahiya edliyê rûniştin, polîsan hatin li me dan û em ji hundir derxistin. Îşkence li kurê min kirin. Dest xistin qirika Ferît. Xwestin Ferît li hundirê edliyê bikujin.”

**Dozger deriye xwe li me venakin**

Emîne Şenyaşar anî ziman ku ew qas li bajaran geriyan, lê hêj mîna berê di edaletê de tiştek nehatiye guhertin û wiha axivî: “Zarokên min di erefata cejnê de li dikana xwe bûn. Hatin li hundir dikanê zarokên min dan ber guleyan. Serokkomar Erdogan jî Suleyman Soylu jî û hikûmet tev vê rastiyê dizanin. Gelê Pirsûsê jî tev dizanin ku zilmê li me dikin. Dozger derî li me venake. Naxwazin em biçin cem wan. Heta niha 8 dozger hatin guhertin.”

**Erdogan dizan nabîne**

Şenyaşar, anî ziman ku dê rojek bê ev dozger cezayê xwe bibînin û wiha berdewam kir: “Bila nebêjin em îro wiha dikin. Ev jî wan re namîne.” Şenyaşar da zanîn ku li gelek partî û rêxistinan geriyan û wiha pêde çû: “Em heta şûna Erdogan jî çûn. Lê ji bo edaletê pêk bê tu piştgirî nedan me. Em li hin cihan qewitandin. Em pir geriyan. Lê kurê min bernedan. Erdogan bi şopa kurê min ketiye. Lê ew qas kesên dizî kirine û mirov qetil kirine bi şopa wan nakeve.

**Saziyan em tenê nehiştin**

Emîne Şenyaşar, bal kişand ser serdanên ji bo piştgiriya wan û wiha berdewam kir: “Ji her derê hatin. Gelek kes hatin. Em bi tenê nehiştin. Bi hatina wan em hêzê digirin. Em pê kêfxweş dibin. Mala wan ava be. Hiqûqnas û nûnerên saziyan bi me re ne. Em edaletê dixwazin. Yên me ziyaret dikin jî dixwazin edalet pêk bê. Dixwazin kurê min ê girtî bê berdan.

**Gotin ‘Edaleta me tune ye’**

Heta niha 8 dozger hatin guhertin. Edalet tune ye. Hejmara  kesên tên me ziyaret dikin zêdetir bûya baştir bû. Hêj edalet pêk nehatiye. Ez çûm li Enqereyê bi şopa edaletê ketim. Gotin ‘Here edaleta me tune ye’ Ez dixwazim bêtir bên ziyaret bikin. Ez dixwazim min bi tenê nehêlin. Ez bi wan bi hêz dibim. Em dixwazin biçin dozger jî ziyaret bikin û zorê li dozger jî bikin. Ez dixwazim kurê min bê berdan û ên zarokên min kuştine bêne girtin.”

Şenyaşar, bal kişand ser yekitî û hevkariya malbatên ku mafê wan ê edaletê hatiye binpêkirin jî û wiha got: “Niha edalet tune ye. Kurê min hêj girtî ye. Parêzer nikarin biçin cem. Em nikarin wî ziyaret bikin. Em dixwazin hemû malbat bên vir û em bi hev re li edaletê bigerin. Em hemû destê xwe bidin hev û bi hev re dengê xwe bilind bikin. Ev hikûmeta zilmê ye. Tenê zilmê li millet dike û milet dikuje. Şenyaşar bang li partiyên siyasî yên wekî CHP, ÎYÎ Partî, Gelecek Partî yên ku ew ziyaret kirin jî kir û wiha got: “Em dixwazin ev partî û rêxistin guh bidin banga me. Em dixwazin ji bo edaletê têbikoşin. Lê niha tiştek dest wan de tune ye. Her tişt di destê Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylu û Îbrahîm Halîl Yildiz de ye.

**Hikûmet pir zalim e**

Şenyaşar bal kişand ser şertên zor ên germa havînê û biryara têkoşîna xwe ya bi israr da û wiha got: “Kurê min girtî ye. Îbrahîm Halîl Yildiz malbata min tar û mar kir. Ez nikarim li mala xwe rûnêm. Hikûmetek pir zalim e.”

Şenyaşar, bi bîr xist ku nexweşiya pî û çavê wê heye û divê ji çavê xwe ve emeliyat bibe û wiha bi dawî kir: “Heta Fadilê min neyê berdan ez ê nobeta edaletê bidomînim. Ez naçim çavên xwe emeliyat nakim. Piştî Fadil hat berdan ez ê biçim bijîjk emeliyat bibim. Heta ez sax bim ez ê li vir nobetê bigirim. Halîl Îbrahîm Yildiz, diz e. Berê 2 kesên din jî kuştibûn. Îmana wan tune ye. Em dixwazin Fadil bê berdan.

**‘Milet tû rûyê Halîl Yildiz dikin’**

Em vê dewletê qebûl nakin. Dewleta ku delîlan veşêre, dîwarên bi xwîn boyax bike û qatilan biparêze em wê qebûl nakin. Vaya ne hikûmet e. Vaya DAIŞ e. Vaya ne hikûmet e IŞID e. IŞID jî wisa nake.

Îro Îbrahîm Halîl diçe ku milet tû rûyê wî dikin. Êdî rayên ku Îbrahîm Halîl ji Erdogan re bistîne tune ye. Heta Fadilê min neyê berdan ez ji vir ranabim. Ez dixwazim kujer bên girtin. Ez dixwazim serbest li bajar negerin.

## Destûrê nadin şewatê vemirînin

Navenda Nûçeyan

Li Herêma Zozanê Şênê ya di navbera Mûş û Amedê de şewat derket. Her roj şewat belavî cihên cuda dibe û ji ber şewatê bi hezaran dar û ber şewitîn û bûn xwelî. Li herêma şewatê bi hinceta ‘ewlehiyê’ destûr nayê dayîn welatî biçin bitefînin. Serokê Giştî yê Komeleya Meşe Îhsan Aytemîş bertek nîşanî şewatê da û got: “Şewitandina daristanê talan e. Em dixwazin sedemê vê şewatê were lêkolînkirin. Bila sûcdar bê ceza nemînin.”

Têkildarî şewatê Miduriyeta Daristanan a Mûşê angaşt kir ku 5 roj in mudaxileyî şewatê dikin lê ji ber şertên herêmê amûrên agirkujiyê û xebatkarên wan nikarin mudaxele bikin. Miduriyetê got derfeta wan nîne ku ji hewa ve mudaxileyî şewatê bikin.



## Bi hezaran sewal mirin

Navenda Nûçeyan

Li navçeyên Elbak, Serav, Payîzava û Qelqeliyê yên Wanê ji ber barana zêde lehî rabû. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin, bi hezaran sewal ji ber lehiyê mirine û bi hezaran donim erd xesar dîtiye. Gihayên cotkaran ên nav erdan bi avê re çûne û gelek axur jî hilweşiyan.

**Serav**

Li gundên Qurcan, Çaxsere, Xirapsork û Êngizê yên navçeya Seravê ji ber lehiyê gelek sewal mirin û erdan xesar dît. Welatiyên ku ji lehiyê xesar gihîştiye wan daxwaz kirin ku desthilat xesara li wan ketiye bibersivîne.

**Elbak**

Li navçeya Elbakê baran li 13 gundan zêde bariyaye û rêya ku diçe navenda navçeyê ji ber lehiyê hilweşiyaye û gelek sewal bi avê re çûne. Hat diyarkirin Heretun, Çûx, Sêgir xesar zêdetir e. Şivanên duh piştî lehiyê agahiyê ji wan nehatibû girtin jî hatine gund.

**Payizava/Qelqelî**

Li navçeya Payîzavayê di serî de gundê Paçan li gelek gundan lehî rabû û xesareke mezin gihîşt erd û gihayên wan. Gundiyan, destnîşan kir ku xebatên tespîtkirina xesara ku gihîştiye wan nehatine destpêkirin. Li navçeya Qelqeliyê jî li gelek gundan xesar çêbû.

# Rêxistinên jinan konferansa Rojhilata Navîn pêk anî

Rêxistinên jinan piştî 8 salan 2’emîn konferansa Jinên Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê pêk anîn. 100 delege beşdarî konferansê bûn. Rola jinê û bandora şer a li ser jinan nîqaş kirin

Navenda Nûçeyan

Rêxistinên jinan, 2’emîn konferansa Jinên Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê bi dirûşma, “Bi yekîtiya jinan, em ê şoreşa demokratîk pêk bînin” bi tevlêbûna zêdeyî gelek jinan li Beyrûdê pêk anî. Konferans bi beşdariya zêdeyî 100 delegeyan pêk hat. Jinên ku nikaribûn rasterast beşdar bibin, bi rêya Zoomê beşdar bûn. Jinên kurd ji çar parçeyên Kurdistanê amade bûn. Peyama Koma Jinên Kurdistanê (KJK) jî hate xwendin.

Peyama Komîteya Amadekar a konferansê ji aliyê Henan Osman ve hate xwendin. Henan Osman têkildarî armanca konferansê û xalên ku jin divê li ser nîqaş bikin ev tişt got: “Piştî 8 salan cara duduyan e em li vir kom dibin. Ji bo gotûbêjkirina pirsgirêkên jinên Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê em kom dibin. Ji ber vê jî divê em rêyên çareseriyê ji bo pirsgirêkên jinan ên ku em niha di vê konferansê de nîqaş dikin raxin ber çavan.”

**‘Têkoşîna jinan bilind dibe’**

Hena Sadik, di konferansê de peyama KJK’ê xwend û wiha got: “Di vê demê de qeyrana siyasî û aborî bandor li ser hemû welatan kiriye. Bandora herî zêde li jinê kiriye. Ji ber wê jî ev jin jî bo çareserkirina pirsgirêkên jinan li vê derê kom bûne. Di nava van çend salên dawî de jinan gelek têkoşînên bêhempa bexşî dîrokê kirin. Lê ji ber nêzîkatiyên desthilata mêrsalar a li hemberî jinan rewş ber bi xirabûnê ve diçe. Bi hezaran jinên êzidî weke koleyan li bazaran hatin firotin. Jinên li Tirkiyeyê dijîn bi tundiyê re rû bi rû ne. Tirkiye  li Başûr û Rojhilatê Sûriyeyê, Libya û li gelek deverên din hewildanên dagirkeriyê dike û ev êrîşên wan bûye metirsiyek mezin li ser jinan. Jin li welatên weke Filistîn, Afganistan, Tûnis û gelek deverên din rastî gelek pirsgirêkan tên. Ji ber vê jî divê hewldana çareseriyeke bifikir, hêz û îradeya jinan were pêşxistin. Em di wê baweriyê de ne ev konferans bibe bersiv ji bo pirsgirêkên jinan û encameke baş bê bidestxistin.”

Li ser navê jinên êzidî Rihan Hesen peyam xwend û got: “Em hêvîdar in ev konferans bibe wesîleya dermankirina birînên jinan. Em weke Tevgera Jinên Êzidî vê konferansê ji bo xwe weke hêzekê dibînin. Di dema êrîşên çeteyên DAIŞ’ê yên li ser Şengalê de weke jinên êzidî me êşên mezin kişand. Ji wê demê  ve hewildanên me hemû ji bo xwe bihêzkirin û bi têkoşînê derbaskirina  van êşan e.”

Nûnerên welatan, di vê beşê de behsa rewşa jinan û têkoşîna ku didin meşandin kirin.



## SÎNEMA NE JI RUHÊ GEL BE BÊ FEYDE YE

# Fîlmên min ziman û çavên gelê kurd in

Evîn Hesen

*Sînemaya kurdî dergehek e ji bo rizgariya gel û welatê me. Rûyê zimanê me, kirasê zar û zêmara me ye. Her wiha kurd hewl didin xwe bi sînemaya xwe bi cîhanê bidin nasîn. Di vê hejmarê de, derhênerê kurd Mano Khalîl ji me re behsa serpêhatiya xwe û sînemaya kurdî kir. Ka em bi hev re dêhn û bala xwe bidinê.*

**Te kengî dest bi xebata sînemaya kurdî kir û çi tiştî te ber bi wê ve kişand, nexasim ku heta astekê di wê demê de ev xebat xerîb dihatin dîtin?**

Di salê 80`yî de bû, piştî ku min bakeloriya xelas kir, ez çûm Şamê, min 6 salan li wir Yasa û Dîrok xwend. Di wê demê de ji aliyê rêjîma Baas a faşîst a Sûriyeyê ve zordariyeke tûj li dijî gelê kurd dihat meşandin, kultur û zimanê wî qedexe dikir.

Di wê demê de ez wekî ciwanekî kurd, welatparêz û çepgir bûm; li serê min xist ku ez sînemayê bixwînim. Min her tişt da ber çavên xwe, ji ber ku bi rastî kêfa min gelek ji fîlmên sînemayê re dihat. Çêkirina fîlman wekî xebateke bo azadiyê bû, xebatek bû ku min pê derd û kulên gelê xwe nîşan dida. Yanî armanca min ji xwendina sînemayê, ne ew bû ku ez fîlmên komedî yan jî dramayên erzan çêbikim, lê kul û derdên gelê kurd şanî dinyayê bidim. Min jî wekî xortekî kurd, bala xwe dayê, madem ez çekê ranakim û naçim serê çiya û şehîd nakevim, belkî ez çend salan ji wan şehîdan zêdetir bijîm û tiştekî ji wan re bikim, belkî bibim dengê wan, dengê dayik û bavên wan û ev jî bi rêya sînemayê re dê pêkan be. Ji ber ku ez wekî karê şervanekî, li karê xwe dinêrim, rojekê ji rojan ev kar ji hola hêviya azadiya gelê kurd derneketiye û her û her ez hewl didim ku fîlmên min bibin ziman û çavên gelê kurd.

**Tu texmîn dikî ku sînema dê ji pirsgirêkên gelê kurd re çareseriyê bîne?**

Her kes dizane ku rêjîmên dîktator bi çi rengî ji sînemaya azad ditirsin, çawa dixwazin ku sînema û fîlmê bixin bin destên xwe û wekî propagandayê bo berjewendiyên xwe bi kar bînin. Fîlmê min *Davîdê Tolhildan* diviyabû ku li Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî bihata weşandin, em hazir bûn, xelk jî hatin, lê berî pêşandana fîlmê bi çend saetan, xeber hat ku Wezareta Kulturê ya Mîrnişînên Erebî nameyek ji rêjîma tirk standiye ku fîlmê *Davîdê Tolhildan* li dijî Tirkiyeyê ye û doza parçebûna Tirkiyeyê dike. Ev meseleya hanê, li Sîngaporê jî pêk hat, konsolosxaneya Tirkiyeyê ya li Sîngaporê bi rengekî fermî ji hikûmeta Sîngaporê xwest ku fîlmê min ji festîvalê biavêjin, ji ber ku li dijî berjewendiyên Tirkiyeyê bû û ji ber ku li ser azadiya kurdan diaxivî. Sînema dikare karê dinyayê biguherîne... gava ku mirov bi hurmet li sînemayê temaşe kir û qedr û qîmet dayê, sînemayê ne wekî karekî bêserî anî ber çavan, dê mirov tê bigihêje ku sînema beşek ji beşên avakirina civaka azad e. Em dizanin, bê çawa rêjîmên faşîst û dîktator welatê kurdan dagir kirine, vê yekê di fîlmên xwe de bi cih kirine û gelê kurd bi çi rengî nîşan dane. Wekî mînak, gelek fîlmên tirkan hene ku gelê kurd wekî gelekî hov û kovî û nemirovnas nîşan didin, da ku bibêjin: "Binêrin kurd nikarin welatekî serbixwe ava bikin..."

Li vir jî erkê li ser milên sînemavanên kurd ew e ku li dijî vê rûreşiya rêjîmên faşîst şer bikin. Divê sînema û fîlmên kurdî, wekî şerê çekdarî doza azadiyê û xebata gelê kurd bikin. Li ser vê yekê, çi qasî dijmin ji karê min aciz be, wilo, ez dizanim ku karê min pîroz e û rêka min sererast e û çi qasî ku dijmin ji karê min û fîlmên min dilxweş û kêfxweş be, wilo, ez dizanim ku ez xizmeta wî dikim û li dijî gelê xwe kar dikim. Sînema şoreşeke bêkuştin û bêxwînrijandin e. Mixabin heta roja îro dezgehên kurd û hikûmetên kurdî ev tişt bi cidî negirtine.

**Tu gelek caran di fîlmên xwe de behsa êşeke siyasî dikî, heta kîjan astê sînema peyamekê yan jî peyaman radigihîne?**

Fîlm eger ne ji ruhê gel be, feydeya wî nîne. Ez wekî kurdekî diaxivim, kurdek ku hebûna wî, kultura wî hatiye bindestkirin. Em dibînin ku çawa dijminên kurdan gefan li hebûna kurdan dixwin, jin û zarokên kurdan direvînin û wan dikujin. Her kurdek îro bi kuştin û tesfiyeyê têne tehdîdkirin. Ji bo hemû beşên Kurdistanê, divê sînema gav bi gav bi şoreşa gelê kurd re be. Ev zordariya sed salan ku li ser kurdan tê pêkanîn divê were aşkerakirin. Ji bo me di cîhanê de 'heval' lazim in. Emosyon ne lazim in. Sînema hevalan çêdike. Lê belê ez wiha bibêjim: "Ev sînemaya min e... Ev fîlmên min in. Ez konsolosekî sînemaya kurdî me li cîhanê... Sed hezar mirov li fîlmên min, li sînemaya min temaşe dikin, bi milyonan xelk, di televîzyonên Ewropayê de li fîlmên min temaşe dikin. Ez çîrokên kurdan dibim malên Ewropiyan. Ez kurdan dikim mêvan li cem wan. Ez hezkirina xelkê bo kurdan ava dikim. Ev karê min e."

**Heta Mano xewna xwe ya xwendina derhêneriya sînemayê bi cih anî, pir westiya û ked da, gelo ewqas zehmetî ji vê xwendinê re diviya? Nexasim ku te dikarîbû li şûna wê bi rihetî bijîşktiyê bixwenda?**



> "Ev sînemaya min e... Ev fîlmên min in. Ez konsolosekî sînemaya kurdî me li cîhanê... Sed hezar mirov li fîlmên min, li sînemaya min temaşe dikin, bi milyonan xelk, di televîzyonên Ewropayê de li fîlmên min temaşe dikin."

Rast e, gava ku mirov kurd be, berî her tiştî, bê welat be, dezgehên ku alîkariya me bikin tune bin, ji bo tu xewnên xwe bigihînî serî dê gelek astengî derbikevin. Eger hikûmeta me ya kurdan hebûya, dibe ku wê jî dê wekî xwendekar alîkariya me kiriba. Her tiştê birûmet, fedakariyek jê re divê. Mirov divê bide pey xewnên xwe, tu carî qels nebe, çi qasî jî mirov zehmetî bikişîne, wê dawî jê re hebe.

Hêvî azadî ye. Hêviya şehîdên kurd jî azadî bû.

Eger hêviya keç û xortên me ji azadiyê tune bûya, ew jî nediçûn şer û jiyanên xwe ji dest nedidan. Îca mesele ev e. Gava ku hêvî, xewn mezin be, zehmetî jî pir in.

Tiştek bi erzanî bi belaş nayê, her tişt qîmeteke wê heye, buhayeke wê heye.

**Te derhêneriya gelek fîlman kir, gelek xelatên cîhanî jî wergirtin, Mano bi van fîlm û xelatan re xwe li ku dibîne?**

Rast e, min gelek belgefîlm û fîlmên lîstikvaniyê çêkirin. Gava ku mirov kar dike, fîlmekî çêdike a girîng ew e ku bigihêje xelkê, temaşevan jê re hebin. Li sînemayê û li ser televîzyonê bêne belavkirin. Ev çîrok li nav gelan bên belavkirin.

Gava ku fîlm li festîvalekê xelatekî digire, ne meseleyeke mezin e bo min. Bo min a girîng ew e ku fîlmê min bê belavkirin. Meseleya min ew e ku ez xwe bighînim temaşevanên xwe. Li Ewropayê tu ferq û cudahî di navbera fîlmên dokumentar û lîstikvaniyê de nîne. Fîlmê min *Mêşvan* der dora 4 mehan di sînemaya Swîsre û Almanyayê de hat temaşekirin, li ser televîzyonên welatên wekî Almanya, Swîsre, Fransa, Awustirya hate temaşekirin û bi sedhezaran mirovan ev fîlm dît. Ev xelata herî mezin e bo karê min. Ez di fîlmên xwe yên dokumentar de behsa êşekê dikim û pê rehet dibim.

**Tu ji çalakiyên sînemaya kurdî razî yî û çawa? Şert û mercên sînemaya kurdî çawa dinirxînî?**

Ev bûye derdora 30 salî ku ez karê sînemayê dikim. Heta roja îro tu hikûmetên kurdan an jî saziyên rewşenbîran, dezgehên kurdî alîkariya min nekirine. Îca karê çêkirina fîlmên min, ji destê min û bi alîkariya welatên cîhanê têne çêkirin. Tu dezgeh, saziyê kurdî ne bi qencî û ne bi xerabî bi min re nebûne alîkar.

Bo wilo ez nikarim razîbûn û nerazîbuna xwe şanî bidim. Ev ne karê min e. Ez ne qadî û miftî me, dîplomeyên welatparêziyê û kurdîtiyê li xelkê belav bikim. Fîlmê min ê dawî min der dora 2 milyon û nîv heta 3 milyon dolar lê xerç kir, tu kesî negot ev fîravînek bo te û stafê fîlmê te. Min sed însan anîn başûrê Kurdistanê, tu kesî ew mirov dawet nekirin û negotin: "Hûn bi xêr hatin welatê me." Min jî wek her kesî vîze stand û min li wir karê xwe kir û qediya. Îca ez ê çi bêjim, heqê min nîne li ser karê xelkê biaxivim.

**Sînema dahênana peyam û mebestan e û afirandina ji gelekî ye. Gelo di vê babetê de sazî yan jî aliyên pê eleqedar dibin hene?**

Rêjîmên kevneperest û dîktator şerê hemû cureyên hunera azad dikin û yek ji wan jî sînema ango fîlm e. Ji gelên bindest re, wekî kurdan, sînema û fîlm gelekî girîng e.

Lê mixabin dezgehên kurdan heta roja îro ev tişt fêm nekirine. Mînak, televîzyon û kanalên kurdan fîlmên tirkan, yên rêjîma Sûriyeyê û Îranê yên dikirin û diweşînin ku tê de ew li dijî kurdan şer dikin. Ew feraset li cem wan hîn çênebûye, ku fîlmên kurdî fînanse bikin, fîlmên kurdî bikirin û belav bikin. Mînak, fîlmê min li televîzyonên Ewropayê tên weşandin, gel û xelk lê temaşe dikin. Lê heta roja îro kanalek, televîzyoneke kurdî -ku bi sedan e – negotine ka em fîlmekî te temaşe bikin. Mînak wek derhênerekî, min fîlm li ser her aliyê Kurdistanê çêkiriye; fîlmê min *Enfal-bi navê Allah, Baas û Seddam* li ser jenosîda Enfalê ye û fîlmê *Hechecîk* li ser cehşên Seddam e, li dehan televîzyonên Ewropayê hatin weşandin. Lê kanalek ji televîzyonên kurdan ew weneşandin û belav nekirin.

Fîlmê min *Davîdê Tolhildan* û *Mêşvan* li ser kurdên me yên Bakur e û tu dezgeh an jî enstîtuyê yan jî televîzyonan rojekê ji rojan negotin ka em wan fîlman biweşînin.

Mînakeke din; fîlmê min ê dawî *Cîran* ku niha dest bi belavbûna xwe kiriye. Bi rastî min gelek zehmetî dît heta ku me ev fîlm çêkir. Cara yekem e ku fîlmek, li ser parçekirina Kurdistanê, li ser sînorê ku di nav kurdan de heye, li ser zilm û zordariya ku li ser gelê kurd li rojavayê Kurdistanê pêk tê û li ser erebkirina erdên kurdan, hat çêkirin. Kesî negot te ewqas zehmetî dît ka were em alîkariya te bikin. Dibe ku ev fîlm bibe stuna sînemaya kurdî ya li rojavayê Kurdistanê, lê mixabin bi bêdengiya xwe ve man.

**Wekî derhênerekî kurd tu pêrgî çi keleman tê?**

Sînema fînans e, sînema pere ye, karê sînemayê profesyonel e, aborî jê re lazim e. Heta roja îro ev mesele nehatiye zelalkirin û hikûmet, dezgeh û enstîtuyên kurdî ev tişt hîn fêm nekirine... Wek mirovekî kurd ku fîlmê min tev li ser kurdan e, problem hene; ez pera bidim ser hev û van fîlman çêkim. Yanî hikûmeta Swîsreyê heqê wê heye bibêje, ma bo çi em ê fîlmên kurdan fînanse bikin? Bira kurd fîlmên xwe bi xwe fînanse bikin...

Lê ez vê xebatê dikim, ez her dem di jiyana xwe de dibêjim: "Qenciya 'xêrê' bike û biavêje behrê."

## Mano Xelîl kî ye?



Derhênerê kurd Mano Xelîl li Qamişloyê hatiye dinê, dibistana xwe ya seretayî û lîse li bajarê Qamişloyê xwendiye, paşê derbasî Şamê bûye. Di sala 1986`an de berê xwe daye Çekyayê. Wî li wir, di Akademiya Sînemayê de, li ber destê mamoste Stanîslav Parnîcky, akademiya derhêneriyê qedandiye. Mano Xelîl niha li Swîsreyê dijî û wekî derhêner, produsent xebatên xwe didomîne. Heta niha der dora 20 fîlmên lîstikvanî û dokumentariyê kişandiye.

# Mirov bê azadî, azadî bê zanebûn nabe!

Elîf Gûn


Îro em di pêvajoyeke pir zor û gîrîng re derbas dibin. Gelek tişt ser û binê hev bibin jî wêje û huner tu caran ranaweste û her dem rola xwe dilîze û dijî xerabiyê serî hildide. Albert Camus dibêje: *"Wêje bi tena serê xwe serhildan e!"* Gelo roman, çîrok û helbest nebûna, halê cîhanê wê çawa bûya? Qirêjî û tarîtiya dinyayê ancax bi wêje, huner û zanistiya estetîkê wê paqij bibe. Wêje zilma zordestiyê bi peyv û hêvokên xwe ve bela wela dike. Lê gotinek heye ku dibêjin: *"Nivîskar hene, tarîtiyê ronî dikin, nivîskar hene roniyê tarî dikin".* Em karin lê zêde bikin, nivîskar hene li defê dixin, nivîskar hene bêdeng di hêlîna xwebûnê de bi eşq û bengîtiyê dinivîsîn. Ali Husein Kerim jî yek ji wan nivîskarên bêdeng e. Lê heta niha bi riya gelek pirtûkên xwe kedeke mezin daye ziman û wêjeya kurdî. Ji bo lîsansa xwe çiqas pirtûkên kurdî hene min kire heqîba xwe, romana Ali Husein Kerim bala min kişand: 'Dar ûl Însan-Rewiyên Sirad El Musteqîm' bi navê xwe jî balkêş bû lê navê pirtûkê û naveroka pirtûkê pir cuda ye. Pirtûk, 2014'an de ji aliyê weşanxaneya Enstîtûya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanista li Almanyayê hatiye çapkirin. Di romanê de em rastî cîhaneke balkêş tên. Bi vê romanê êdî em bi çavekî din li cîhanê dinêrin. Roman ji hevdeh beşan pêk tê.

Her tişt bi vegera Pîro dest pê dike. Pîro, Silêman, Elî û Dr. Ehmed hevalên zahf nêzî hev in. Ji piçûkayiyê heya ciwaniya xwe bi hev re ne. Lê belê rojek tê Pîro tê girtin. Piştî ku Pîro tê girtin her tişt diguhere. Xeyaleke mezin a her çar hevalan heye. Ew dixwazin di pêşerojê de li welatekî azad, xwedî maf, wekhev bijîn. Piştî ku Pîro tê girtin her sê hevalên din hêviya xwe ji bo hevalê xwe û xeyala xwe mezintir dikin. Girtina Pîro, ji aliyê serdestan ve nabe asteng her weha her sê hevalên din dixwazin xeyala xwe pêk bînin. Her weha di destpêka romanê de Pîro serleheng e. Çimkî vegera Pîro dibe sedem ku her sê hevalên din bigihîjin hev û xeyalên xwe pêk bînin. Her çar heval Pîro, Elî, Silêman, Dr. Ehmed dixwazin welatekî wisa biafirîn ku mirov bi mirovbûna xwe bizanibin. Çima em bi çavên oldarekî bûyeran dibînin? Çimkî nivîskar civaka xwe baş nas dike û civaka ku kurd û neteweyên din bi hev re dijîn baş aniye ziman. Destpêka romanê pir balkêş e. Roman bi helbestekê dest pê dike. Helbesteke ku armanca her çar hevalan rave dike û ji bo vê armanca xwe pêk bînin digihîjin hev. Piştî ku Dr. Ehmed vê helbestê dibihîse zahf di bin bandora vî dengî de dimîne. Di romanê de helbest wek amûreke girîng hatiye bikaranîn. Her çar lehengên romana "Dar ûl Însan-Rêwiyên Sirad El Musteqîm" jî dixwazin bindestiyê veçirînin û bi helbestan armanca xwe dewlewend bikin. Her çiqas rê dirêj û dijwar jî be her çar leheng ji zehmetiyên dijwar re derbas bibin jî roj tê xeyalên xwe pêk tînin. Her weha helbesteke her çar hevalan, dibe sirûda TEVBÛGERÊ.

Di romanê de herî zêde mafê neteweyan û mirovan li ber çav in. Her çar heval dema ku dixwazin welatekî biafirînin armanca wan ne bi tenê ji bo kurdan e. Her çar heval dixwazin welatekî wisa biafirînin ku her netew, dîn, mezhep, ziman hwd. bikaribe bi azad bijî. Welatekî çawa û bi çi awayî wê biafirînin? Her çend di dîrokê de utopya rexneyên cihêreng di hundirê xwe de bihewînin jî derfeta pêkanînê pir qels e. Dibe ku mîna xuya bike jî çîrokên pêşerojê yên mirovan, danasîna îdealan, rexnekirina serdemên ku tê de dijîn û tê de hatiye nivîsandin û epistemolojîya fîlozofan û lehengên çîrokê jî nîşan dide. Ji ber vê yekê ev celebek girîng a felsefeya siyasî ye. Yekem utopyaya ku tê zanîn xebata Platon a bi navê ***Dewlet*** e. Ji Platon heta îro naverok di warê utopyayên siyasî, utopyayên tirsnak, utopyayên dîrokî û hwd. nav û şêweyên cuda gelek utopya hatine vegotin. Avabûna dewletê, peywir û hêzên wê, têkiliyên gel û dewletê, taybetmendiyên ku divê di mirovên dewletê bi rê ve dibin de werin dîtin, hêmanên bingehîn yên erken wan û hwd. mijar û babetên sereke yên dewleta siyasî ne. Di romanê de qala du dewletan tê kirin. Xeribistan û Şerqistan. Çima nivîskar li ser çar lehengê ku bi her awayî ve cuda ji xêncî kurdbûna wan hewl dayê civakek an dewleteke ava bike? Di romanê de xelkê Şerqistanê dixwazin zimanê xwe biaxivin, dixwazin çanda xwe biparêzin, dixwazin bibin xwedî sazî hwd.. Ji ber ku Xeribistanê mafên neteweyên cuda, ku kurd jî di nav de, qedexe kiriye, pelçiqandiye, çewisandiye. Li Xeribistanê neteweyên ku zagonên wan pêk neyîne di nav rewşên nebaş de dijîn. Her çar heval ji bo Şerqistanê li ser modelên rêveberiya îdeal difikirin ka dê bexteweriya şêniyên civakê çawa misoger bikin? Ji bo zagon û artêş ku hêmanên bingehîn ên dewletê ne, pîvanên bingehîn çi ne? Ji bo Şerqistanê azadî, wekhevî, mafê zimanê zikmakî û hwd. e. Di van xwestinan de kîjan gel, netewe û serdest di damezrandina civakê de pêşî li neteweyên din jî digire. Di romanê de rêbaz û rêgezên wan aşkera dixuyê. Ev roman bersiva van pirsan di çarçoveya utopyayên siyasî, dînî, civakî de vedibêje. Lehengekî sereke yê romanê jî Silêmanê teolog e. Niviskar roman li gorî rewşa wan honandiye û anegorî wê civakê, peyama xwe vedibêjin. Nivîskar, utopyayên her çar hevalan bi nêrîn û di xebatên wan de nîşan dide. Raman her çiqas cuda be dîsa jî dikarin şêweyê dewleteke komunal biafirînin.

Qesta me di vir de çi ye? Roman ji aliyê utopyayê ve dişibe pirtûka Platon a ***Dewlet***ê, lê belê, ji aliyê hilweşandina desthilatdariyê ve jî dişibe romana George Orwel a bi navê ***Çewliga Heywanan***. Mixabin di Çewliga Heywanan de, piştî hilweşîna desthilatdariyê jî sîstemek nayê avakirin. Lê belê di romanê Dar ûl Însan–Rêwiyê Sirad El Musteqîm de piştî bêhîkarhîştina deshilatdariyê, sîstema bi navê TEVBÛGERÊ ava dibe. Dibe ku rojekê ji rojan di jiyana pratîkî de bibe rewşa kurdan a taybet. Ger rojek kurd rizgar bibin belkîm wek di romanê de hatiye destnîşankirin, dê nikaribin sîstemekî ava bikin. Yan jî kurd rojekê bibin xwedî dewlet belkî karesateke bêhempa pêk were. Lê belê di romanê de em bi çar nêrînên cuda dihesin, bi çar kesên xwedî hişmendî dibînin ku hizra wan her çiqas utopîk jî be xwendevan hêvî ji wî welatî dike. Belkî rojekê welat azad bibe û kurd bikarin bi cudatiyên xwe bijîn; pirtûk herî zêde vê nîşanî xwendevan dike. Nivîskar, wek serlehengê romanê kesê hilbijartiye him teolog e him jî zana ye. Em bi çavê Silêman her tiştî dibînin. Silêman, lehengekî vekirî ye. Çima me got vekirî ye? Silêman ji rexneyan re vekiriye. Dema ku xeyala xwe pêk tîne dixwaze tu car ji rexne û ji fikrên cuda netirse. Her weha tu kesî jî nadarizîne. Silêman lehengekî pir cuda ye. Nivîskar, bi kesayetiya Silêman, rewşa lehengekî him dîndar, him rêvebir, him jî rewşenbîr tîne berçavê xwendevan.

Dînê îslamê bi sedan salan pê de bandoreke mezin li ser civaka kurdan kiriye. Silêman, pênaseya Xwedê bi hişmendiyeke mezin derdibirre. Deshilatdaran her tim dînê wek çeka bingehîn bi kar tînin. Silêman dixwaze wê çekê ji destê wan wergire û rastiyê nîşanî gel bide. Her weha, ew dixwaze gelê xwe bi çeka deshilatdaran ji bindestbûnê xelas bike. Silêman bi melayan re dikeve nîqaşan. Dema ku bi kesên xwe wek zana, dîndar an jî mele dibînin re dikeve nîqaşê her tim bi daneyan, yanî bi hedîs û Quranê wan rexne dike an jî xeletiyên wan tîne ziman. Sirad El Musteqîm çi ye? Ew rêya ku mirovan dibe rastiyê. Rêwiyên Sirad El Musteqîmê bi 'aqil' dikarin bigihîjin rastiyê an jî ronahiyê. Dema ku min roman xwend 'Alegoriya Şikeftê' a Platon îna bîra min. Platon difikire ku hin kes di şikeftekê de, li bin erdê dijîn. Van kesan pişta xwe dane şikeftê û li ber devê şikeftê rûniştine. Dest û lingên wan girêdayî ne û tenê dikarin dîwarê şikeftê bibînin. Her weha li pişt wan dîwarekî bilind heye. Dîsa li pişt vî dîwarî hin wêneyên mîna mirovan hene û gelek tiştên cuda li dîwar digirin. Ji ber ku agir li pişt van tiştan dişewite û siya tiştan li ser dîwarên şikeftê têne xuyakirin. Tiştên ku niştecihên şikeftê dibînin tenê ev 'şanoya siyê' ye. Ji ber ku ji roja dayikbûnê heya niha di wê şikeftê de ne û li wir rûniştibûn. Ew difikirîn ku tenê siya tiştên ku dibînin heye. Lê heke yek ji wan ji vê esarete xelas bibe, ew ê vê yekê bi dest bixe ku pêşî jixwe bipirse ka siyên li ser dîwar ji ku tên. Gava ku ew dizivire û tiştên ku li dîwêr hatine ragirtin dibîne pêşî şaşwaz dibe. Ji ber ku ronahiyê pir xurt dibîne. Her weha ji ber tiştên tûj yên ku ew dibîne, ji ber ku heya niha tenê siya tiştan ditiye. Ew di ser dîwêr re dikeve û li nêzî agir dest bi hilkişîne dike. Ji ber xwezaya derveyî şikeftê çavên wî bêhtir tîr dibin. Lê belê piştî ku hinekî çavên xwe gerand. Ew ecêbmayî dimîne, dibîne ku her tişt çiqas xweşik û xweş e. Ew di jiyana xwe de cara ewil reng û xêzên tûj dibîne. Ew her weha heywan û kulîlkên rastîn jî dibîne. Ew fêm dike ku tiştên di şikeftê de ji nuxseyên xerab in. Lê belê yên ku niha dibîne tiştên xweşik in. Lê niha ew ji xwe dipirse ka ev kulîlk û ajal ji ku derê hatine. Wê hingê ew ê li ezman û li rojê mêze bike û fêhm bike roj e ya ku giyan û giyanewerên di xwezayê de zindî dike her wekî ku ew agir pê ketiye ku dihêle ew siya di şikeftê bibîne. Niha ew pir kêfxweş e ji şikeftê bireve here xwezayê hembêz bike û ji azadiya xwe ya nûhatî peyda bike û kêf bike. Lê ew dîsa jî vedigere ser fikra xwe ku di şikeftê çi diqewime. Piştî vegera xwe ew hewl dide ku merivên şikeftê yên din qanih bike ku siyên ew li dîwaran dibînin tenê metelokên tiştên rast in. Lê belê kes jê bawer nake. Ew dîwêr nîşan didin û dibêjin ya ku ew dibînin tiştên heyî ne. di dawiyê de wan ew baş xistin. Teoriya şikeftê û rêwiyên sirad el musteqîm di raman û bikaranîna aqil ve dişibin hev. Lewra di romana Dar ûl Însan-Sirad El Musteqîm de raman, fikir û rexneyên rast tiştên sereke ne. Nivîskar, bi Silêman ku ew teolog e, riya rast fikr û rexneyên rast yanî bi riya felsefeye vedibêje. Xeribistanê sedan salan zimanê Şerqistanê û neteweyên cuda qedexe dike. Xeribistan cudahiyan qebûl nake. Tenê dixwaze herkes bi zimanê Xeribistanê xeber bidin, bibin wek wan. Çimkî ew serdest in û yên cuda qebûl nakin. Her çar heval dixwazin li welatê ku afirandine her netew azad bijî, azad bifikire. Her çiqas ji bo vê armanca xwe rastî dijwariyan werin jî -ku Pîro tê girtin- gund tên wêrankirin, kavilkirin her çar heval qet behs nakin. Dijwarî nabe astengî her weha dijwariyên ku ditîne dihêle ku bigihîjin armanc û xeyalên xwe.




Ali Husein Kerîm wekî nivîskarekî sosyalîst û realîst bi romana xwe xwediyê cihekî girîng e. Bi vê romana xwe berdevkê civakên taloqkirî, tepisandî ye û hiştiye ku xwendevan qîrînên wan neteweyên tepisandî bêne bihîstin. Di Xeribistanê de serdest û bindest hene. 'Înce Mehmed' a Yaşar kemal jî bi vî rengî hatiye nivîsîn. Dîsa qala serdest û bindestan tê kirin. Bi vî rengî romana Ali Husein Kerîm Dar ûl Însan bi berawirdkirina şikefta Platon re dibe wekheviyeke ku bi wêrektiya zilam û ew kesên ji şikeftê derketine bûne xwedî maf û azadiyê. Romana Ali Husein Kerîm, mirov dikare bêje tehma ceribandinê jê tê, nivîskar bi zanebûn ev atmosfer û leheng ava kirine. Jiyana civakî ya serdema xwe nivîskar, destnîşan dike û bi tevgera çar hevalan ji bo armanca xwe vegotina xewn û xeyalekî pêk tînin. Her çar heval doza xwe bi rê ve dibin, xwendevan beşdarî qada xwe, xala sereke ya doza xwe dikin. Lewra nivîskar, xebatên wêjeyî temsîl dike û bi kar tîne. Di romanê de, pergalên dîn û baweriyê wekî doktrîn û prensîba exlaqî, civakî û siyasî di jiyana civakên Şerqistanê de roleka girîng dilîze. Lê belê di heman demê de nivîskar, bingeha çalakiyên fikrî, lêgerîna felsefî, hiş, vîn û tevgera hestiyariyê nîşanî xwendevanên xwe dike. Lewma di romanê de dîn pergalên civakî û hem jî yên kesayî dinimîne. Di romanê de hizra dînî xwedî pêywira hevkarî û yekbûna îdeolojî û beşên civakê ye. Nivîskar, anegorî hewcedariya civakê îdeolojî vekolandiye.

Niviskar, mijara romanê, li dora lehengên xwe rêxistiye û bi ber armancên xwe teşe girtiye. Lehengan bi bîrdozî erka şoreşgeriyê hildane ser xwe. Lê ev îdeolojî materyalên derûnî yên peşkeftinên şoreşgerî peyda dike û di heman demê lehengên romanê piştî qonaxekê diyar dikin. Lehengên romanê, rolên bertekdar jî dilîzin ji ber ku ew teşwîqkirina dabeşkirina civakî jî dikin. Di vir de bêhemdî Nietzsche tê bîra mirov, ku dibêje 'Xwedê mir' Bi kuştina xwedê armanca Nietzsche çi bû? Bêguman hêjayiya jiyanê, mirovatiyê û xwebûnê ku mirov bibe berpirsiyarê xwe. Rastî û heqîqet her dem wek rojê ye, a herî girîng ew e ku cudahiya mirov çêbibe û mirov ber bi heqîqetê ve hilbikişe. Di her rêzikeke vê romanê de bayê zanebûnê dilive û rewiyên azadiyê bang dikin, azadî bê zanebûn nabe. Nivîskar, şûna ku bibêje 'Dar ûl Îslam' gotiye "Dar ûl Însan". Yanî azadîya însan ji dîn, mezheb û hemû yasayan girîngtir e li cem wî.

# Partiya Demokrat a Kurdistanê û tesfiyekirina serokên kurd û dijberan

Serdem Silo



Ji destpêka damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û heta îro, ev partî li ser bingeha tasfiyekirina her rikberekî yan tevgereke kurdî ku ji siyaseta wê nerazî ne, bi hevkariya ajandayên derve, nemaze dewleta tirk û Amerîkayê xwe dide sazkirin. Helbet ji bo li ser desthilatdariyê bimînin. Dema ku em li zindanên başûr mêze dikin, em dibînin ku bi sedan siyasetmedarên dijber di zindanan de ne. her wiha nahêlin ku siyasetmedarên ji derveyî herêmê yên li herêmê dimînin çalakiyên xwe yên siyasî bidin meşandin.

Di dirêjahiya dîrokê de û heya îro, PDK'ê tevgerên Kurd û hemî dijberên xwe tasfiye kiriye da ku textê xwe biparêze. Ev 30 sal in malbata Barzanî û partiya wê dest ji serokatiya Herêmê bernadin. Dema em hin bûyerên dîrokê vedibêjin, em dibînin ku çawa PDK'ê rayedarên di nava partiya xwe de û hin beşên din ên Kurdistanê tesfiye kirine. Di sala 1972'an de piştî ku 12 kadroyên Partiya Komunîst a Iraqê perwerdeyeke siyasî li Yekîtiya Sovyetê bi dawî kirin û di dema vegera wan de, bi riya Sûriyê ji bo Iraq û ketina wan bo herêma Bahdinan, ji aliyê rayedarê leşkerî yê PDK'ê li wê deverê Îssa Siwar ve hatin girtin û hemû hatin kuştin. Piştî mirina Barzaniyê bav, bi fermana Idrîs û Mesûd Barzanî, Endamê Komîteya Navendî ya PDK'ê Şêx Mihemed Hersîn hate revandin û kuştin. Her wiha bi sedan nav hene ku PDK'ê ew tesfiye kirine.

PDK'ê bi tesfiyekirina rikberên di nava partiya xwe de bes nekir. Li Rojhilatê Kurdistanê dema ku komeke şoreşgerên Kurd dest bi çalakiyên xwe yên li dijî rêjîma Şahê Îranê kirin, Silêman Mihênî El-Marûf û Mella Ehmed Şalmaşî El-Marûf û Îsmaîl Şerîf Zade û Mihemed Emîn Sîracî û Qadir Şerîf û Xelîl Şawbaş û Ebdullah Îshaq û gelek hevalên wan di salên 1967 û 1968'an de komîteya şoreşgerî birêxistin kirin û dameziran-din. Çakakiyên wê koma şoreşgerî li Rojhilata Kurdistanê hişt ku rêjîma Iraqê gelekî tengezar bibe, têkiliya wê rêjîmê jî bi PDK'ê re gelekî xurt bû û ji bo rê li pêşiya xebat û çalakiyên wê koma şoreşgerî bigirin, rêjîma Îranê ji PDK'ê xwest ku van hemû şoreşgeran tesfiye bike. Li ser vê yekê PDK'ê û bi hevkariya alîgirên xwe dest bi reşkirina wê koma şoreşgerî kir. Li devera Sîtek a nêzî Silêmaniyê çekdarên PDK'ê kemînek li dijî koma şoreşger vegirtin û di encamê de rayedar Silêman Mihênî û Xelîl Şewbaş hatin girtin û li pêş çavên Mihênî rêhevalê wî Xelîl Şewbaş gulebarankirin.

Piştî wê, Mihênî ber bi girtîgeha ku jêre dihate gotin; baregeha fermandariya şoreşgerî, di wê demê de di bin serweriya Barzaniyê bav de bû. Li vir Mihênî rastî gelek destdirêjiyan hat û hewldan ku teslîmkariyê qebûl bike û bikin sîxurekî xwe. Lê tevî hemû hewldanan Mihênî bi lehengî li hemberî PDK'ê li ber xwe da û teslîmkarî qebûl nekir. Piştî ku hemû hewldanên wan têk çûn di 15'ê gulana 1998'an de PDK'ê bi fermana Barzanî, Mihênî gulebaran kir û cenazeyê wî radestî berpirsê rêxistina îstixbarat û ewlehiya netewî ya rêjîma Îranê (SAWAK) general Beyatî kirin. Bûyerên kuştin û tesfiyekirina rayedar, şoreşger û pêşmergeyên kurd ên rojhilatê Kurdistanê ku hejmara wan bêtirî 70 şoreşgerî bûn, bi destên PDK'ê hatin meşandin.

Xiyaneta PDK'ê ne tenê di vê astê de bû, lê di heman demê de şoreşgerên Kurd ên bakurê Kurdistanê wekî Seîd Elçî, Dr. Şivan û gelek kesayetiyên din ên Kurd jî têde bûn. Îro, em dibînin ku PDK'ê heman siyasetê li hemberî rikberên xwe yên hundur dide meşandin da ku li ser textê xwe bimîne û xizmeta ajandayên derve bike. Xebat û çalakiyên partiyên kurd ên li başûrê Kurdistanê ji ber siyaseta tesfiyekirinê ku istixbarata PDK'ê dide meşandin, felc bûne. Di encamê de bi sedan rikberên siyaseta PDK'ê hatine girtin û niha di zîndanan de dimînin û bi taybet çakakvanên Behdînanê.

Bêguman divê em behsa êrîşa çeteyên DAIŞ'ê li dijî Mexmûrê bikin û çawa gerîlayan li rex pêşmergeyan şerê terorê kir û çawa ku dema Barzanî serdana Mexmûrê kir, spasiya hêzên gerîla kir. Lê piştî ku metirsiya çeteyên DAIŞ'ê li ser Hewlêrê hate şikandin, PDK dîsa vegeriya ser siyaseta xwe ya dijberiya welatiyên Mexmûrê û ev bêtirî du sal in dorpêçeke giran daniye ser kampa Mexmûrê.

Tevî ku Barzanî qaşo şerê navxweyî heram kiriye, lê îro em dibînin ku çekdarên PDK'ê li dijî gerîla hevkariya dewleta tirk dikin. Hin caran çekdarên PDK'ê li Herêmên Parastina Medya bi awayekî rasterast êrîşî gerîlayan dikin da ku berxwedana gerîla li dijî artêşa Tirk lawaz bikin. Ev yek jî di çarçoveya hevkariya PDK'ê bi Tirkiyeyê re ye da ku tevgerên kurdî tesfiye bike, çawa ku PDK'ê tevgerên kurdî li parçeyên din ên Kurdistanê tesfiye kirine.

Wekî din, tevî hemû hewildanên ku ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ve ji bo avakirina yekitiya neteweyî, PDK li şûna ku bibe desteka piştgiriyê ya avakirina yekitiyê, xebatên wê asteng dike, ji ber ku bi armanca avakirina neteweyî yekbûn û xêzkirina stratejiyeke kurdî, li beramber bûyerên niha yên li herêmê û rêgirtina li ber şerê navxweyî, Kongreya Neteweyî du mehan li pey hev civiya. Lê PDK'ê heta niha bersiva daxwaza Kongreya Neteweyî ya civîn û civînekê nedaye wan da ku bigihîjin nêrîneke hevbeş. Dema ku em behsa van bûyeran dikin di dirêjahiya dîroka PDK'ê de, em dibînin ku ew dikevin nav kategoriya xiyanet û xebitandina bi navê kurdî da ku hemî tevgerên kurd ên li dijî dagirkirina li Kurdistanê li ber xwe didin tasfiye bike û aramanc ew e ku PDK li ser textê bimîne. Ji bêr Hewlêr ji bo PDK'ê ji giştî Kurdistanê girîngtir e.



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Tirkiye penaberan wekî çekekê bi kar tîne

Ji ber rewşa xwe ya jeopolîtîk Tirkiye di gelek mijaran de xwedî avantejeke girîng e. Rêvebiriya Enqereyê di mijara penaberan de vê avantaja heyî li dijî welatên rojavayî wek çekekê bi kar tîne. Li gor daneyên fermî yên Rêxistina Koçê ya Navneteweyî di sala 2020'î de welata ku herî zêde penaber lê hene Tirkiye ye.

Di van çend salên dawî de ji ber êrişên DAIŞ û bêîstiqrariya heyî ji Sûriye û Iraqê bi milyonan kes ji bo derbasî welatên ewrûpa bibin berê xwe dan Tirkiyeyê. Hêjmarek zêde îranî jî li Tirkiyeyê heye. Di van demên dawî de bi taybetî piştî Amerîkayê ragihand ku wê hêzên xwe ji Afganistanê bikişîne pêl bi pêl penaberan berê xwe da Tirkiyeyê. Ji xwe di vê mijarê de her roj em li ser ekranên televîzyon û malperên nûçeyan de dîmen û wêneyên vê tradejiyê radixe ber çavan dibînin. Lê dewleta tirk wek ji hatina van penaberan keyfxweş e, dengê xwe nake.

Bêguman li cihekî zilm, kuştin an go mafên mirovan ên herî bingehîn bên astengkirin, bên qedexekirin mirov neçar dimînin ku ji bo jiyanê berê xwe bide cihekî din. Lê cihê ku diçe jî divê li ser hebûna van kesan hesabê qirêj çêneke. Di çarçoveya normên mirovî de nêzî van penaberan bibe. Lê mixabin dewleta tirk berovajî van penaberan li dijî welatên rojavayî wek tehdîdekê an go wek şantajê bi kar tîne. Mînakên vê di mijara Sûriyeyê de me bi awayekî vekirî dît. Ez bawer dikim ku kesên gotinên Erdogan ên "ger hûn neyên ser ya me em ê deriya vekin wê bi milyonan penaber berê xwe bidin welatê we" ji bîr nekiriye.

Di vê astê de wisa vekirî tehdît, di mijara penaberan de rûpoşa ser rûyê dewleta tirk daxist. Lê mixabin tevî ku ev ji derveyî qanûnên navnetewî ye û mafê dewleta tirk nîne mûameleyek wisa xirab li dijî penaberan bide meşandin jî kes dengê xwe jê re nake. Lewma desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê jî vê di her mijarê de wek firsetekê bi kar tîne.

Bi hinceta ku ez pêşî li penaberan digirim li seranserî sînorê di navbera bakur û rojavayê Kurdistane de dîwar lê kir. Her kesê ku li ser herêmê xwedî agahî ye baş dizane ku dewleta tirk ev dîwar ne ji bo pêşî li penaberan bigire lê kir. Di vir de yekane armanca dewleta tirk dorpêçkirina herêma rojavayê Kurdistanê ye. Bi lêkirina dîwar qaşo nahêle kes qaçax derbas bibin. Lê ew hemû çeteyên xwe di derîyên sînor re bi awayekî qaçax derbasî welat dike. Dema canê wan dixwaze pêşî li penaberan vedikin û kom bi kom penaber derbas dibin. Lê bi navê: "Va ye ez li hemberî penaberan tedbîran digrim" jî dîwar lê dike. Ev jî di vê mijarê de durûtiya dewleta tirk bi awayekî eşkere radixe ber çavan. Dewleta tirk ji bo di mijara Sûrî de destê xwe xurt bike û xwe li ser siyaseta navneteweyî ferz bike li dijî welatên rojavayî çeka penaberan bi kar tîne.

Bêguman di van demên dawî de zêdebûna hêjmara penaberên Afganistanê jî parçeyekî vê polîtîkaya qirêj e. Her kes dizane ku rejîma AKP-MHP dixwaze li Afganistanê bi cih bibe. Rewşa Afganistanê niha şolî ye. Wê rewş ber bi ku ve biçe ne diyar e. Wisa diyar e ji bo çareseriya pirsgirêka heyî wê di qada navneteweyî de hin xebat bên kirin. Ji bo di mijara Afganistanê de jî dewleta tirk li ser maseyê rûnê hewl dide bi penaberan destê xwe xurt bike.

Di mijara Sûriyeyê de çawa tevgeriya û çi kir heman tiştî ji bo Afganistanê jî dike. Yanî me berê ev lîstik berê dîtiye. Li herêma Wanê li ser xeta sînorê di navbera bakur û rojhilat de, çavê xwe ji hatina penaberan re girtin û bêdengiya heyî vê aşkera dike.

Bi kurtasî dewleta tirk li ser xwîna feqîr, hejar û mexdûran siyasetek qirêj dide meşandin. Di rastiyê de tişta ku dewleta tirk dike sûc e. Divê dewleta tirk ji ber van pêkanînên xwe yên dijmirovî bê darizandin. Lê ji ber hemû dewletên modernîteya kapîtalîst bi heman ferasetê li ser ked û xwîna mirovan hatine avakirin kes ji kesî re dengê xwe dernaxe. Gava ku berjewendiyên wan zerar bibînin û şûn ve wê têkevin nav newildanan û bi navê "mafê mirovan tê binpêkirin" wê qiyametê rakin. Ev jî bi awayekî aşkera durûtî ye.



# Miletê bêrêxistin teqez dibe hedefa dijmin

Navenda Nûçeyan

Di 23’yê tîrmehê de 4’emîn kongreya Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê pêk hat. Nûnerên civaka êzidî, pêkhateyên ereb, kurmancên sûnî, mesîhî û şîe jî di kongreyê de amade bûn. Ji ber pêkhateyên cuda jî tev li kongreyê bûn, hejmara endamên rêveberiya meclisê ji 73 kesan derket 111 kesî. Li gorî bandor û şêniyên pêkhateyan kota ji van pêkhateyên cuda yên derveyî êzidiyan re jî hate veqetandin. Li gel sîstema hevserokatiyê di derdora sedî 40’î de jin di rêveberiyê de cih digirin.

Piştî kongreyê Cîgirê Hevserokê Meclisa Demokratîk a Şengalê Heso Brahîm, diyar kir ku ji ber êzidî bê parastin û bê rexistin bûn fermana 3’ê tebaxa 2014’an bi serê wan de hat û wiha got: “Miletekî bêparastin û bêrêxistin, teqez wê bibe hedefa dijmin. Niha em nêzî salvegera fermanê dibin. Xwişkên me hêj li bazaran tên firotin. Divê em dersekê ji vê yekê derxin. Meclisa Rêveberiya Xweser di sala 2015’an de hat avakirin. Me ji meclisa avaker îro xwe gîhandiye meclîsa xweseriyê. Me kongre pêk anî. Eger ku em îro kongreye pêk bînin em bûne xwediyê rêveberî, rêxistin û hêzek. Eger êzidî xwe bi xwe, xwe bi rê ve nebin, êzidî nikarin bijîn. Ji ber ku hawîrdorê me mîna guran e.”

Heso Brahîm, qala xwebirêvebirinê kir û wiha axivî: “Gelek aliyên rêvebirinê hene. Yek xwe parastin e. Îro YBŞ û YJŞ parastina derdora Şengalê dikin. Asayîşa Êzidxanê di nava şengalê de parastinê dike. Em xwe diparêzin û xwe bi rêve dibin. Ya din di şaredariyê de, di her aliyî de xizmetê dikin. Xizmeta rê û kareba dikin. Xwe bi xwe



Cîgirê Hevserokê Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Heso Brahîm, diyar kir ku ji ber bê rêxistin û bê parastin bûn bi fermanê re rû bi rû man û êdî xwedî parastin û rêveberiya xweser in...Eger êzidî xwe bi xwe, xwe bi rêve nebin, êzidî nikarin bijîn

xizmeta xwe dikin. Dîsa aliyê siyasî wekî Meclîsa Rêveberiya Xweser heye. Meclîs ji hemû saziyan pêk tê. Ji hêzên leşkerî, siyasî, çandî, dînî û aborî pêk tê. Di hemû aliyan de tu xwe bi xwe bi rê ve dibî.”

**Şengal êdî nabêje ‘Ez xulam’**

Heso Brahîm, têkildarî helwesta dijminê xwe jî wiha got: “Dijmin lê dinere ku îro Şengal ne mohtacî derve ye. Şengal ji hêza derve re nabêje “Ez benî”, “Ez xulam” dijmin ji ber vê rewşê har û dîn dibe. Ji ber vê yekê bi heft hêzan êrîşî Şengalê dikin. Gotegotan li ser Şengalê dibêjin. Dibêjin Şengal ne aram e, ne ewle ye. Dema tu bi hêz bî hesabê te dike. Lê dema tu ne bi hêz bî dijmin hesabê te jî nake. Em armanc dikin ku Şengal bi her aliyî ve xweser bijî. Bi awayekî demokratîk û bi rengê xwe bi xwe bi rê ve bibe. Rast e li Şengalê piranî êzidî ne, Lê baweriyên din jî hene. Em rêzê ji hemû baweriyan digirin. Baweriyên din şekî, şîa, sunî û yên din nûnerên xwe şandin û nûnertiyên wan di rêveberiyê de cih girt.”

**Em êzidî ne yên beriya 2014’an in**

Heso Brahîm li ser hêza êzidiyan a niha jî rawestiya û wiha berdewam kir: “Em êzidî xwedî hêz û rêxistin in. Em ne ew êzidiyên berî 2014’an in. Meclisa Rêveberiya Xweser dê ji bo gelê Şengalê bibe mînak. Wê di her aliyî de bibe bersiv. Wê bibe meilisa hesabxwestina pêvajoya beriya 2014’an. Meclis dê hesab ji wan hêz û kesên bûne sedema fermana li dijî êzidiyan, bipirse. Dê bibe meclisa hesabpirsînê. Wê wan însanan bibe dadgehan û hesab ji wan bixwaze. Em xwedî maf in û em doza mafê xwe dikin. Em tiştekî li dijî zagonan naxwazin. Em ter û hişk bi hevre naşewitînin. Em rêzê ji pêkhateyên din ên wekî mesîhî, sunî, şiî û ereb re digirin. Kesên ketibin xwîna êzidiyan ew tu carî nayên efûkirin. Sed sal derbas bibe jî em ê hesabê wê bipirsin. Hatina pêkhateyan a nava meclisê peyama ‘em ne li dijî dînên din in. Ev peyama jiyana hevpar e. Em nabêjin hemû ereb DAIŞ in, lê em nabêjin hemû ereb paqij in jî.”

**Çima miletê me çûye?**

Heso Brahîm, li ser vegera gele Şengalê jî wiha axivî: “Beriya em bibejin bila miletê me li Şengalê vegere, em dipirsin. Em dibêjin: ‘Çima miletê me çûye? Miletê me ne ji ber kêfxweşî û seyranê çûn. Ji ber zilm û zorê neçar man çûn di nava şertên zor de dijîn. Li wan kampên lê dijîn jî di bin zext û zordariyê de ye.’ Wekî rêveberiya xweser bi dehan caran me bang kir û em dîsa bang dikin. Niha siyasetek li dijî Şengalê tê meşandin. Wekî cihekî xerab ne ewle û nayê jiyîn nîşan didin. Bi vê yekê tirsekê çêdikin ku yên koç kirine dîsa venegerin. Wekî rêveberiya xweser ji bo miletê me vegere em ji her tiştî re amade ne. Ev miletê me ye. Divê em xizmeta wan bikin. Ev erka me ye.”

**Bang**

Brahîm, herî dawî bang li parazvanên mafên mirovan kir û wiha bi dawî kir: “Em bang li her kesên ku dibêjin em parazvanên mafên mirovan û demokrat in dikin. Divê vê zilma tê sere miletê me qebûl nekin. Sê beşên ku koç kirine û di kampan de dijîn eger ev metirsî û gef ji ser wan bê rakirin dê vegerin Şengalê. Kesên ku îro li kampan dijîn êzidî ne. Ne bi serê xwe ne. Em ji van kampan re dibêjin zindanên servekirî. Kengî miletê me berê xwe didin Şengalê, an Şengalê bombe dikin, an jî wekî tifaqa 9’ê Cotmehê bi Iraqê re peyman îmze dikin û rê li pêş hatina wan digirin. Miletê me wekî êsîr bi kar tînin. Çawa DAIŞê miletê me ji bo xwe kiriye mertalên zindî wan jî kirin mertal. Çawa di saetekê de 400 çadirên kampê şewitîn. Ji bo wan bitirsînin wisa dikin.”

# Nûnerên PYD’ê ev 50 roj bûn li ku bûn?



Amed Dîcle

Mistefa Osman Xelîl, Cîhad Hesen û Mistefa Ezîz Mistê. Ev her sê siyasetmedar û dîplomatên kurd ji rojavayê Kurdistanê ne û bi salan e li paytexta başûrê Kurdistanê Hewlêrê jiyana xwe didomînin. Her wiha ji bo kar û barên Rêveberiya Xweser a Rojava jî dixebitin.

Cîhad Hesen nûnerê Rêveberiya Xweser ê Hewlêrê ye. Mistefa Osman Xelîl nûnerê PYD’ê yê Hewlêrê ye. Û Mistefa Ezîz Mistê jî endamê PYD’ê ye.

Mistefa Osman, Cîhed Hesen û Mistefa Ezîz roja 10 hezîranê li balafirgeha Hewlêrê hatin revandin. Her sê nûnerên Rojava ji aliyê hêzên asayîşê ve hatin revandin. Cîhad û her du Mistefa ji bo ku hin mêvanên xwe yên Ewropî pêşwazî bikin çûbûn balafirgehê. Çûn lê mixabin ne karibûn mêvanên xwe pêşwazî bikin û ne jî karibûn vegerin mala xwe.

53 roj berê ev bûyer qewimî. Piştî 50 rojan 2 endamên PYD’ê hatin berdan. Di 50 rojan de Rêveberiya Xweser a Rojava û gelek rayedarên rojava daxuyanî dan. Malbatên her sê kesên ‘winda’ bang li PDK’ê kirin. Lê ne hikûmeta başûrê Kurdistanê, ne PDK, ne YNK’ê, ne Asayîşê tiştek negotin û nabêjin.

Her sê kurdên rojavayî ku li Hewlêrê hatin revandin tenê carekê telefon ji bo malbatên xwe vekirine û gotine tenê em dikarin 3 deqeyan biaxivin. Wan gotiye rewşa wan a tenduristiyê nebaş e, tehdeyî li wan tê kirin. Di bin îşkenceyê de ne. Ji bilî vê telefonê wekî din tu agahî nîne.

Nûnera Rêveberiya Xweser a başûrê Kurdistanê Nûrşan Hisên der barê mijarê de dibêje hewldanên wan heta niha neghiştine tu encamê. Li gorî agahiyên ku Nûrşan Hisên dane, rayedarên li Hewlêrê tu bersivekê nadin bangên wan. Rewş hatiye wê astê ku êdî bi nûnerên Rêveberiya Xweser re hevdîtin jî pêk naynin.

Mistefa Osman Xelîl, Cîhad Hesen û Mistefa Ezîz Mistê dema ku telefonî malbatên xwe kirine gotine ew nizanin ji bo çi hatine girtin û heta niha tu sûcdariyek li wan nehatiye kirin. Nûrşan Hisên jî dibêje heta niha ew nizanin hevalên wan bi kîjan sedemê hatine girtin. Ji ber ku rayedar tu tiştekî nabêjin.

Her sê nûnerên Rojava ku em behsa wan dikin li Hewlêrê bi awayekî fermî/resmî kar û bar dikin. Tu tiştekî derveyî qanûnê nîne. Eger tiştek wisa hebe jî ev karê dadgehê ye. Lê heta niha der barê rewşa wan de tiştek neçûye dadgehê. Yanî revandin û girtina wan ne ji ber meseleyeke yasayî ye.


Her wiha, hikûmeta başûrê Kurdistanê bi awayekî fermî Rêveberiya Xweser nas nake. Lê heta niha di navbera wan de têkilî hebûne û hene. Dema pirsgirêkek çêbibe rêya diyalogê vekiriye. Parlamentoya Başûr di mijdara 2014’an de biryara naskirina rêveberiya xweser da. Lê mixabin hikûmetê ev yek pêk neanî.

Nûnerên Rojava li tevahiya cîhanê bi taybet jî ji ber berxwedana li hemberî DAIŞ’ê bi rêzdarî tên pêşwazîkirin. Tenê li Enqere, Tahran û Hewlêrê nayên qebûlkirin. Xwediyê vê şermê jî xwe nas dikin!

Li gorî hin agahiyan endamên MÎT’ê bi xwe jî çûne Hewlêrê û nûnerên Rojava lêpirsîn kirine. Eger tiştek wiha hebe ev jî dide xuyakirin ku hikûmeta Başûr çiqas bi îrade ye(!)

Ev sed sal e li Iraq, Sûrye, Îran û Tirkiyeyê bi hezaran siyasetvan û çalakgerên kurd ji aliyê rejîmên van dewletan de hatin revandin, zilm li wan hat kirin. Lê îro li herêmek ku navê wê Kurdistan e û rêveberên wê herêmê kurd in, nûnerên parçeyekî din ê Kurdistanê têne revandin, îşkence li wan tê kirin, der barê aqûbeta wan de tu tiştek nayê gotin. Gelo eger ev tiştek asayî be ev kes çima dernaxin dadgehê? Eger MÎTa tirk neketiba lêpirsîna wan çima rayedarên PDK’ê nabêjin tiştek wisa tune? 53 roj derbasbû çima nabêjin ev kes ji ber filan tiştî hatine girtin? Her wiha çima nayê gotin ku ev kes li ku bûn, di kîjan zindanê de bûn? Bi biryara kîjan dadgehê hatine girtin? Çima tu gotinek nayê gotin?

Û çima tiştên ku rejîma Baasê li xelqê Başûr dikir hûn îro li nûnerên Rojava dikin?



# Her tim berxwedan bi ser ketiye

Navenda Nûçeyan

**Bi sedan sal in Kurdistan tê parçekirin. Sînoran mayin dikin û dîwaran li ser sînoran lê dikin. Lê kurd sînoran nas nakin û her tim li dijî sînoran li ber xwe didin. Dîrok nîşan dide ku her tim maf û berxwedan bi ser ketiye û encam girtiye**

Bi sedan sal in bê navber Kurdistanê parçe dikin. Bi peymana Qesrî Şîrîn a 1639'an Kurdistan kirin 2 parçe. Bi peymana Lozanê ya 1923'an Kurdistan kirin çar parçe. Sînor di nava malbatan de ava kirin û malbat parçe kirin. Li herêmê, Nisêbîn-Qamişlo, Cizîrî, Qoser, Serêkaniyê, Pirsûs malbat hatin parçekirin. Malbat li binxet û serxet hatin hiştin û ji hev hatin qutkirin. Kurdên hatin parçekirin, meriv, xizm û nasên hev bûn. Mayîn û astengî nas nekirin û dîsa çûn û hatin. Gelek birîndar bûn. Gelek seqet man. Lê dîsa jî çûn û hatin. Têkiliyên xwe berdewam kirin.

Mirovên herêmê ji bo debara xwe bikin bazirganî dikirin. Lê piştî sînor hatin xêzkirin, vê carê bi nepenî li ser sînor bazirganiya xwe berdewam kirin. Hikûmet û dewletê navê vê bazirganiyê kirin 'Qaçaxçî' û xwestin bazirganiya gel a bi sedan salan dikin wekî karekî dijzagonî" nîşan bidin. Li dijî bazirganiyê gelek astengî ji welatiyan re derxistin. Li ser sînoran mayin çandin. Esker li ser sînor bi cih kirin. Lê dîsa gel bazirganiya xwe berdewam kir. Dîsa ziyaretên hev berdewam kirin.

90 sal piştî peymana Lozanê vê carê sînorê ku berê li ser mayîn çandibûn, li ser wan dîwar ava kirin. Xwestin li seranseri bajarê Nisêbînê ji betonê dîwarekî bilind ava bikin. Xwestin bi temamî jiyana kurdan qut bikin. Têkiliyên mirovî û civakî qut bikin. Bi taybetî, piştî ku kurdên rojavayê Kurdistanê bi tekoşîna xwe bûn xwedî rêveberî, hikûmeta Tirkiyeyê xwest bi temamî têkiliya Nisêbîn û Qamişlo qut bike.

**Berxwedana Gokkan bi ser ket**

Li Nisêbînê piştî dîwar ava kirin, Şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan, di Cotmeha 2013'an de li dijî Dîwarê Şermê dest bi rojiya mirinê kir. Ayşe Gokkan 9 rojan çalakiya xwe berdewam kir. Gokkan li cihê ku hikûmetê 'Dîwarê Şermê' ava kir, di nava ´mayînan´ de rûnişt û dest bi rojiya mirinê kir. Esker û polîsan bi maşîneyên zirxî Gokkan dorpêç kirin. Lê tevî vê yekê bi hezaran jin û ciwan li dora Ayşe Gokkan, kom bûn û piştgirî dan wê. Çalakiya Ayşe Gokkan a li dijî Dîwarê Şermê li cîhanê deng veda. Ji bajar û navçeyên derdorê gel herikî ser sînor û piştgirî dan Ayşe Gokkan. Piştî çalakiya bi israr û biryar berdevkê hikûmetê Bulent Arinç neçar ma ku daxuyaniyê bide.

HDP, KCD û gelek rêxistinên civakî û sivîl piştgirî dan Gokkan. Piştî piştgiriya gel û israra Ayşe Gokkan a li dijî sînor, hikûmetê gav paşve avêt û Gokkan di çalakiya xwe de bi ser ket.

Lê hikûmet dest ji avakirina dîwaran bernade. Niha dîsa dîwaran ava dikin. Dîsa seranserî sînoran bi betonên 3 metre bilind dîwar ava dikin. Vê carê TOKÎ bi ferman û daxwaza hikûmet û dewletê li ser sînorê Sûriye û Îranê dîwaran ava dikin. Li Sûriyeyê ku sînorê wê ji 911 km pêk tê, li ser 711 km'yî blokên ku 3 metre bilind, 2 metre pahn û 7 ton giraniya wan heye bi cih kirin. Bi giştî 350 hezar blok li ser sînor bi cih kirin. Li ser sînorê Îranê 144 kîlometre dîwar lê kirin. Li ser sînorê Colemêrg Gever û Bajirgê jî 43 km dîwar ava kirin. Li her 300 metreyan nobetgeheke leşkeran hatiye bi cih kirin.

**Bi sînoran kurdan parçe dikin**

Hikûmet bi vî dîwarî dixwaze bi temamî pêwendiya parçeyên Kurdistanê qut bike. Piştî Rojava niha bi bahaneya ku penaberên îranî û afganî derbasî Tirkiyeyê nebin û ji wir jî neçin Ewropa, li sînorê Rojhilat beton lê dikin. Ev sînor jî bi heman awayî bilind û bi ber e. Tê gotin sînor niha ji Ebexa Wanê ya Bakurê Kurdistanê dest pê kiriye û 3 kîlometre temam kiriye. Sînor wê seranserê herêmên Bakur ên dikevin ser sînorê Rojhilat bigire nava xwe de. Ev jî dike dirêjahiya 63 kîlometreyan.

Bi heman awayî li ser sînor 110 kîlometre xendek kolaye û 103 bircên kontrolê jî çêdike. Dîsa cihê ku sînor û dîwaran lê ava nake, qaleqol û qereqolan ava dike. Li ser sînorê navbera başûr û bakurê Kurdistanê hem ji ber pir çiyayî ye hem jî ji ber dixwaze hêza xwe li ser axa başûr bi cih bike niha dîwaran ava nake. Lê li şûna dîwaran qaleqolan ava dike. Gundan vala dike û herêmê bê mirov dihêle.

Li aliyekî sînoran ava dikin û bi mayîn û dîwaran çûn û hatinê qut dikin. Li aliyê din di nav parçeyan de bi rêya bendavan gel ji hev qut dike. Warên bi xêr û bereket di bin avê de dihêle. Şûnwarên dîrokî û warên çandiniyê di bin avê de dihêle.

**Berxwedan bi ser dixe**

Dema em li vê hewldana hikûmeta Tirkiyeyê dinêrin, her tim an dixwaze kurdan ji hev parçe bike û belav bike an jî dixwaze kurdan bê war û bê mal bihêle. Warên dîrokî wekî Heskîf û Xalfetî an di bin avê de dihêle an jî wekî Sûrê hildiweşîne. An jî wekî hezaran gundên kurdan vala dike û dişewitîne. Lê dema kurd li dijî vê yekê dibin yek û li ber xwe didin jî bi ser dikevin. Mînaka vê yekê dema Şaredara Nisêbînê ya berê Ayşe Gokkan li dijî 'Dîwarê şermê' li ber xwe da encam girt û bi ser ket. Lê dema dest ji berxwedanê berdidin û temaşe dikin, vê carê parçekirin, dabeşkirin, talankirin, wêrankirin û dagirkirin didome. Dîrok nîşanî me dide ku her tim berxwedan bi ser dikeve.




# Di nav kurdan de ajal xweza û mîhrîcan

Şervan Çîçek

Di nirxên civakî de xweza cihekî pir girîng û taybet digire. Li gor xwezayê û zagonên wê mirov jiyana xwe sererast dike. Bi qasî ku mirov jiyana xwe bidomîne mirov xwe li gor xwezayê dike nifşek nû. Kurd wek qewmê kevnareyê Rojhilatê Navîn, li gorî erdnîgariyê weke çand, folklor, huner û jiyana rojane, jiyana xwe didomînin. Li Rojhilatê Navîn kurd wekî gelê çiya tên nasîn. Ev jî tê wê wateyê ku ji çiya sihûd digirin û li gor çiya tevdigerin. Navên xwe rengên xwe ji çiya digirin û didin çiya. Zozan, mêrg, koçerî û xweykirina ajalan, mêşin, bizin, hesp, hêştir ji bo kurda cihekî girîng digire.

Li gor zabûna ajalan, çûyina zozanan, çêre û çêregehan, çand û hunerderdikeve holê. Xweza, ajal û kurd dema di salê de tên ber hev bi xwe dibin huner û kurdistan dibe ciyê mîhrîcanan. Her çiqasî teknolojîya niha mirovan guhertibe, çand û hunerê di nav polîtîkaya qirêj de yekser kiribe jî, kurdan dev ji kevneşopiya xwe bernedaye. Her çiqasî di tevgerê de motîfên nû girtibin jî bi qeyde û qisasên xwe û bi rengên xwe pîrozbahiyên salê bi cih tên. Em dikarin bejin ji bo kurdan sal pîroz e. Zivistan dema tê herkes li benda berfê ye. Bi ketina berfê re sal dest pê dike. Sala ku berf xweş bikeve ew sal çêrgeh geş in. Sibat, adar, nîsan û gulan jî mehên baranê ne. Ji bo ku zad û mêwe baş bigihîjin hewce ye baran baş bibare. Destpêka havînê zabûna xwezayê bi xwe ye. Mêwe kulîlkên xwe tijî dikin, êdî tên xwarin. Payîz despêka amadekariya zivistanê ye, berhevkirina gil û giya, vegera ji zozanan û çûyîna ser rezan e payîz. Piştî çêkirina dims, meşlûr, bastêq, kesmeyan zivistan tê. Çar demsal yek jê zivistan e. Zivistan sersala kurdan e. Her çiqasî serê sala kurdan wek Newroz bê dîtin jî kurdên bakûr di serê çileyê de serê sarsalê pîroz dikin. Xwarinên xweş tên çêkirin. Mewîj, bastêq, kesme bihîv, gûzên ku di sandoqan de ne tên derxistin. Didin ber mêvanan. Êvara sersalê zarok xwe bi cil û bergên kalik, pîrik, mela û mezinên din dixemilînin. Mal bi mal digerin sersalê bi govend û stran pîroz dikin. Di navbera stranan de biwêjan li hev tînin. Ji ber dilê malbatan xweş bikin wekî serê salê binê salê xwedê tijî bike dergûşa malê hwd.



Sersal wek despêka jiyana sekinandî ye. Di dawiya çileyê de ku hefteya paşî dikeve sibatê zabûna ajalan dest pê dike. Ji ber kêfxweşiya zabûnê ku zabûn weke nûbûnê tê dîtin hinek pîrozbahî tên kirin. Weke çarşema serê zîpa û çarşema sor. Ev her dû mîhrîcan li dû hev tên pîrozkirin. Di nav kurdan de ji vê pîrozbahyê re serê pez tê gotin. Piştî pîrozbahiyê serê pez newroz dest pê dike. Newroz hatina biharê, dema xebata çandiniya zeviyan, amadekariya çûyîna zozanan ne. Li gor salnameya Romî 3 pîrozbahiyên serê pez hene, Çarşema Serê Zîpa, Çarşema Sor û Newroz. Li ziyaretgeha li ber agir bi govend, stran û dîlanan tê pîrozkirin. Gel ji malên xwe dertên kincên paqij li xwe dikin berê xwe didin kendal û qotên bilind dia dikin. Pêşiyan ji bo vê mehê gotine: "Eyn dikin weyn dikin du roj û dankî ji adara xwişka xwe deyn dikin, teşkê gîskê digirim, li ser sergo werdikim." Hefteyek piştî Newrozê pîrozbahiyên ser Hivdeh dest pê dike. Karik û berxikê zane êdî bi xwe ve tên dimijin, çêregeh geş dibin, ev yek jî coşek mezin dide xwediyê ajalan. Ji ber wê yekê tê gotin, hivdê adarê çilo bû zimanê karê. Zabûna ajalan diqede, çêregeh û çiloyê daran pel vedikin. Di rojên Hivdeh de amadekariya çûyina zozanan, rê û rêbaza çûyîna xebatên wê tên kirin. Li ser Hivdeh miyek tê gazîkirin ku wê di serê gulanê de bê jêkirin. Hivdeh sê roj li ber xwe dide.

Nîsan her roj her roj, adar nav roj nav roj, gulan bi ba, hêstirê beecî, ce di cîda ma.

Xwesteka baranê di mehên biharê de çêregehan û zeviyan tê xwestin. Meha gulanê di navbera havîn û biharê de ciyek girîng digire. Zedê di payîzê de hatiye avêtin, genim, ce, nîsk, nok û hwd. bi gulanê re serê simbilê wan tijî dibin, ber bi zerbûnê ve diçin. Pîrozbahiya vê mehê jî Serê Gulanê ye. Serê Gulanê di nav gel de Barodan tê gotin. Serşivan derê axuran vedikin, didin pêşiya pez, beran dide dû şivan, mêşin didin dû berxên nûzayî û didin dû wan. Pêşiya berê xwe bidin zozanan serşivan wan dibe ziyaretgehan. Li gor baweriyê çar caran li dor ziyaretê pez tê gerandin. Dûra beranê ku di dema Serê Pez de hatiye gazîkirin tê jêkirin. Şêniyên bi pez re hatine ziyaretgehê beran digurin. Dipêjînin û dikin xêra salê û rêwîtiya zozanan. Şênî bi hev re xwarin dixwin. Bi govend, dîlan û şahî roja xwe derbas dikin. Amadekariyên xwe diqedînin berê xwe didin zozanan.

Di tebaxê de beranê baş têne bijartin, ji bo bergirtinê bera nav mêşina didin. Beran Berdan bi şahiyekê dest pê dike. Beran bi kesk, sor û zer tên xemilandin. Keçikên ber zewacê dema beran dixemilînin nîşaneya xwe bi quloçê beran girêdidin. Def û bilûr lêdikevin, govendvan govendê digirin. Yên din li wan temaşe dikin. Desgirtiyên keçikan tên desmala girêdayî vedikin. Dikin destên xwe diçin serê dîlanê. Dê bavê keç û xortan dema Beran Berdanê de hîn dikin ka zarokên wan ji kê hezdikin. Ku bi dilê wan bûya zû dikirin diçûn wan ji hev re dixwestin. Deweta wan dikirin. Her çiqasî niha bi vê yekê nebe jî kurd he jî li pey kevneşopiyên xwe diçin û di demên salê de mîhrîcanan li dar dixin.

Serê Pez: Dema zabûna pez e. Çilê paşîn e.

Barodan: Dema pez dertê çêrgehê. Serê gulanê ye.

Beran Berdan: Payîzê beran berî nav mê ya didin.

# Estbîyayîşê kurdan rê tehamul nêkenê

Mehmet Şahîn

**Hêrîşê qirkerdişî yê vera kurdan di sê û pancês serrî yo verdewam keno. Komara tirkî ya ke 98 serrî verê cû ser hişmendîya Îtîhat Terakî ameye awankerdiş, wazena vîşêrê nasname û etnîsîteyê tirkîtî nasname û etnîsîteyê bînan heminan çinê bikera**

Wexto ke dewleta Osmanî kewte serdemê qelsbîyayîş û têkşîyayîşî, herinda ke vernîya têkşîyayîş û çinêbîyayîşê xo bigêra sere de bi projeyê 'Îttîhad-i Anasir' waşt bi tay ray û raybazanê dayîşê tay heqanê civakî heme şaran, heme nasname, heme civakan û heme bawerîyan binê sêwanê osmanîyan de verdê û înan rê rayberî bikero. La qederêk badê cû vîna ke serkewtîşê nê projeyî mumkun nîyo. Şaro ke bi serran binê bindestîya osmanîyan de cuya bî, seba azadîya xo sere wedart û yew bi yew dewleta osmanî ra qerifîya yî.

Bado ke selahîyetdarê osmanîyan vîna serkewtîşê projeyê 'Îttîhad-i Anasir' mumkun nîyo, peynîyê serdemê osmanîyan de II. Abdulhamîd projeyê 'Îttîhad-i Îslamî' areno rojeve. Wazenê bi nê projeyê xo heme civakanê misilmanan binê sêwanê osmanîyan de xora girê bidê û înan rê rayberî bikerê. La qederêk bado cû vînenê ke serkewtîşê nê projeyî zî mumkun nîyo. Civakê misilmanî seba azadîya xo sere wedartî û yew bi yew osmanîyan ra qerifîya yî.

Nê civakê misilmanan ra yew zî kurd ê. Kurdê ke zaf rayan seba azadîya xo sere wedaritî, ser nêkewenê. Çinêbîyayîşê tîfaqo neteweyî, bêbextî û îxanetê xomîyanen nêverdenê civakê kurdî ser bikewo û sey civakanê bînan azad bibo.

Bado ke selahîyetdarê tirkan vîna ke serkewtîşê projeyê 'Îttîhad-i Îslamî' mumkun nîyo hişmendîya Îtîhat Terakî ya nîjadperestî vistî merîyet. Hişmendîya Îtîhat Terakî de heme civakê bînî çinê yenê hesabnayîş û çinêkerdişê înan esas yeno girewtiş. Hişmendîya Îtîhat Terakî de awankerdişê dewletêka yew etnîkî ya tirkî esta. Yanî 'turanîzm' esto. Na dewleta yew etnîkî de yew ziwan, yew çand û yew nasname esas yeno girewtiş. Heme şaranê Anatolya û Kurdistanî ser de tirkbîyayîş yeno ferzkerdiş. Ya tirkbîyayîş ya zî çinêbîyayîş esas yeno girewtiş. Na polîtîkaya xo ya qirker de heme şaran û etnîkan kenê qurbanê yew şarî û yew etnîkî ya tirkî. Wazenê dergûşê çand û civakan Anatolya û Kurdistanî heme şaran ra pake bikerê û bikerê tirkistan.

Seba ke nê projeyê xo de ser bikewê, sîyasetê qirkerdiş û çinêkerdişê civakan esas gênê. Netîceyê no sîyasetî de civakê sey ermen, rum, rumê pontusî, asurî, keldanî, suryanî û yê sey înan, yê ke misilman nîyê heme bi qirkerdişan çinê kerdî.

Seba ke hûmara civakê kurdî zaf biba û koyanê xo yê asê û qedîman de bicuwîyo û misilman bî, raşteraşt nêşikayî bi hêrîşanê qirkerdişî serê kurdan de şêrê. Seba ke kurdan ser de sîyasetê çinêkerdîşî yê nerm, kedîkerdiş û çinêkerdîşî esas ame girewtiş îna rê vanê ke; 'seyna bibo kurdî misilman ê, olê ma û yê înan yew o, dewletê emperyalîstî wayîrê înan nêvecîyenê, bêwayîr ê û dostê înan çinî yê, ma do zî hêdî hêdî înan bihelnî û çinê bikerî. Kurdê ke polîtîkaya çinêbîyayîşî qebul nêkerê û sere wedaritî do sereyê înan bêro pelexnayene.'

Belê 98 serrî yo no sîyasetê çinêkerdişê kurdan û tirkistankerdişê Kurdistanî bi heme xirabiyanê xo merîyet de yo. Kurdê ke çinêbîyayîş û tirkbîyayîşî qebul nêkerê sey "terorîst" îlan kenê û verê çimanê dinya de çi soret nêmaneno ke nêarê serê înan. Her cayan de yenê pelçiqnayîş. Çiqas vengê kurdan berz bîyo, çiqas xoverdayîşê kurdan xurt bibo, çiqas kurdî wayîrê ziwan, nasname û çandê xo vecîyayê, hendêk hêrîşê pelexnayîş û qirkerdişî yê vera kurdan zêde bîyê. Destpêkerdiş û xurtbîyayîşê xoverdayîşê Têgêrayîşê Azadîya Kurdan yê serra 1990an ra nata nê hêrîşî serr bi serr zêdîyayî û hêrîşê nîjadperestî yê qirkerdişî ser civakê kurdî de pê yeno. Netîceyê nê hêrîşan de dewlete bi hezaran kurdan qetil kerde û na çarçewe de kesêk daxî nêame cezakerdiş.

Hêrîşê ke ser Rojawayî pê yenê, dagirkerdiş û hewldayîşê tirkerdişê Efrîn, Girêspî û Serêkanî, hêrîşê dagirkerdişê Başûrê Kurdistanî û tasfîyekerdişê Têgêrayîşê Azadîye, qirkerdişê xozayî û mîrateyê hezar serran, talankerdişê serê erdî û binê erdî yê Kurdistanî, çinêkerdişê tarîx û keleporê kurdan yê hezar serran, hêrîş û dewaya girewtişî



yê HDPyî heme çarçeweya na projeyê çinêkerdişê kurdan û tirkistankerdişê Kurdistanî de pê yenê.

Bêguman, hêrîşê ke şaristan û metropolên Tirkîya de pê yenê tesaduf nîyê. Heme bi zanayî û çarçeweya plansazîyê qirkerdişî ya seserre de pê yenê. Hêrîşê ke nê rojanê peyînan de têdima Afyon, Anqara û Konya de pê ameyî verdewamê plansazîyê înan ê û hetê navendê Şerê Taybetî ra yenê organîzekerdiş. Kurdê ke vajo ez kurda û bi ziwanê kurdî qalî kena, projeyê çinêkerdişî înan puç keno û çimanê înan de o/a kes beno/a "terorîst" û beno/a hedefê hêrîşanê na hişmendîya qirker.

Hewceyo merdim hêrs û nefretê dewleta tirkî ê vera Rayberê Şarê Kurdî Ocalan û Têgêrayîşê Azadîya Kurdan no çarçewe de bigêro dest û fehm bikero. Seba ke Rêzdar Ocalanî na polîtîkaya înan ya çinêkerdişî teşhîr kerdo û puç kerdo, vera êy de hêrsê selahîyetdaranê dewleta tirkî zaf berzo. Zanê ke heta Rêzdar Ocalan û Têgêrayîşê Azadîye bibê do ê nêeşkê kurdan çinê bihesebnê û çinê bikerê. Coka bi heme qewetê xo hêrîşê înan kenê.

Bi kilmî kurdê ke xo înkar nêkerê, qalê esbîyayîşê xo bikerê û vera projeyê çinêkerdişê înan vecîyê benê hedefê hêrîşanê hişmendîya faşîstî. Seba ke HDP projeyê çinêkerdişê kurdan qebul nêkeno û qalê esbîyayîşê kurdan keno û çareserîya demokratîke wazeno beno "terorîst" û beno hedefê heme tewir hêrîşanê hişmendîya faşîst. Tena kurdî nê, tirkê bi wijdan ê ke qalê esbîyayîşê kurdan kenê û demokrasî wazenê zî benê "terorîst" û bi hêrîşanê hişmendîya faşîst reyde rî bi rî manenê.

Bi nê hêrîşan kurdan ra vanê: "Ya şima do nasnameyê xo, ziwanê xo, çandê xo, esbîyayişê xo yê kurdîtî ra fek vera bidê û tirkbîyayîş qebul bikerê, ya zî ma do şima bipelçiqnî û çinê bikerî."

Bi nê hêrîşan wazenê bawerî û vînê kurdan ê azadîye bişiknê, bi ceresnê, bêveng bikerê ke kurdî kurdîtî û xoverdayîşê azadîye ra fek vera bidê. Tirkê wayîrê wijdan rê zî vanê: "Nêbo nêbo şima xo nizdîyê kurdan bikerê û qalê estbîyayîşê înan bikerê."

Wina asîyeno ke çiqas kurdî ro ziwanê xo, ro çandê xo wayîr vecîyê û azadîya xo de, estbîyayîşê xo de israr bikerê û çiqas tîfaqê xoverdêranê kurdan û tirkan xurt bibo do hende hêrîşê hişmendîya faşîstî zêde bibo. Seba xopawitişî hewceyo kurdî rêxistinbîyayîşê xo xurt bikerê û tîfaqê xoverdayîşê kurd û tirkan berz bikerê.

Ya ke zerrîya merdimî dejnena hetê tay kurdan ra fehmnêkerdişê na polîtîkaya çinêkerdişî ya. Tay sazî û dezgeyê kurdan hema zî eşkenê dewleta tirke reyde, bi na hişmendîya ke estbîyayîşê kurdan rê tehamul nêkena û her cayan de hêrîşê kurdan kena, hevalbendî bikerê.

Hewceyo na hişmendîya faşîst a qirker bizana ke kurdê ke 40 serrî verê cû hewnê mergî ra hîşyar bîyê û seba azadîya xo xover danê û bedêlê zaf giranan dayî, nê hêrîşan nêceresyenê, serê xo nêtewênenê û bi mergê xo bo zî azadîya xora fek vera nêdanê.

# Keyeyê şehîdan: Cenazayê şehîdanê ma ça de yê?

Dewleta tirke ya îşxalkere Rojawan de bi hawayêkê sîstematîkî hêrîşê şehîdgehan kena. Tewr peyên dewleta tirke ya îşxalkere Efrîn de şehîdgehê nêzdîyê Nêweşxaneyê Avrînî xera kerd. Şehîdgeh de cenazayê şerwananê YPG, YPJ û HSDyî estbî. Dewleta tirke cenazayî şehîdgehî ra vetî la nêzanîyeno ke cenazayî ameyî berdene bi kamca. Ajansê fermî yê Tirkîya Anadolu Ajansi (AA) cenazayî sey 'gorê komkî' mojnabî.



Xeylêk raporan de sûcê dewleta tirke yê vera Efrînî ameyî eşkerakerdene ke nînan ra yew zî raporê Komîteya Cigêrayîşê Mîyanneteweyî ya Sûrîye yo. Dewleta tirke zanayêne uca de gorê şehîdan estê la qestî ra şarî xapînena. Dewletê mîyanneteweyî vera cînayetanê Tirkîya bêveng ê. La ma amade yê ke pêro delîl, şahîd û dokumentanê xo pêşkêşê înan bikerê. Goreyê Peymana Laheyî dewleta tirke gereka sivîlî bipawitêne û vera goran hêriş nêkerdêne. Dewleta tirke peymananê mîyanneteweyîyan binpay kena.''

Endamê Rêxistina Heqanê Merdiman a Efrînî Cibrayîl Mistefayî derheqê mesele de qisey kerd û vat: ''Ma dî ke Ajansê Anadolu vano 'Efrîn de gorê komkî dîyayî û nê kesî destê YPG-YPJyî ra kişîyayî.' Nê cenazayî pê kefenan, tek tek ameyê definkerdene. Gorê komkî la wina benê? Ê şehîdgehî de cenazayê domananê ke bombardumanê dewleta tirke de kişîyayî estbîyî. Ma komîteyêka mîyanneteweyî ra wazenê ke wa şorê nê cenazayan ser o cigêrayîş bikerê. Wa dewleta tirke zî îdîaya xo ya cînayetî îsbat bikera. Tirkîya her hetî ra îflas kerda. Hînî destê ci de çîyêk nêmendo coka hêrîşê şehîdgehan kena.

Kênaya şehîd Mihemed Mistefayî Ayîde Mistefa vat: ''Babîyê mi Hêzê Asayîşê Zereyî de wezîfedar bi û bombardumanê dewleta tirke de şehîd bi. Ma 14ê adara 2018î de babîyê mi û 35 şehîdê bînî pê merasîmêkî ê şehîdgehî de defin kerdî. Ez venga rayaumûmîya mîyanneteweyî dana ke cenazayanê ma wa bidê ma. Ma nêzanenê dewleta tirke ma ra, şehîdanê ma ra çita wazena. Ma wazenê rojêke abigêrê Efrîn. ''

Babîyê şehîd Ehmed Xanêyî Ebdîn Xanêyî zî vat ke lajê ci Ehmed 12ê adara 2018î de şehîd bi û binê bombardumanî de înan lajê xo defin kerd. Xanêyî venga pêro dezgehan da ke wa bimusê ke dewleta tirke cenazayê înan se kerdê. ***ŞEHBA***

## Kerê te pîr e

Zilamek ji xwe re li kerekî digere ku ji xwe re bikire. Diçe navçeyeke Amedê, vir de û wê de dipirse. Gelo kerê firotinê li vir hene an, na?

Mirovek jê re dibêje kerek li filan derê heye. Tu dixwazî here bibîne. Ku te eciband, ji xwe re bikire.

Zilam diçe ber deriyê xwediyê kerê û dibêje: “Bihîstina ku min bihîstiye dibêjin kerê we yê firotinê heye. Gelo ez dikarim wî bibînim? Xwediyê kerê dibêje: “Lê çawa” û diçe kerê ji axurê dertîne û dibêje: “Kerê min ê firotinê ev e.”

Zilam li devê kerê dinihêre û dibêje: “Xalo welahî kerê te pir pîr e, ji min re nabe. Bibore!”

Xwediyê kerê: “Xwarzê welahî min digot qey tu ji jehrekê fêm dikî. Lê ne wisa ye. Binihêre ev ker bû bîst sal ku li ber deriyê min e. Lê rojekî kerekî wekî te negot ev ker pîr e.”

***Riza uyar***



## Dermanê kuxikê

Dermanfiroş derbasî dermanxaneya xwe bû dît ku zarokek di nava dermanxaneyê de rûniştiye. Wiha bê deng xwe ji ciyê xwe nalivîne û rûyê wî sor bûye. Dermanfiroş ji ciwanê berdestê xwe re got çi bela vî zarokî ye. Berdestê wî got: “Wele ev camêr hat ba min gelekî dikuxiya û ji min re got dermanê kuxikê bide min. Lê min dît ku zêde dikuxe min dermanê navçûnê dayê.

**Dermanfiroş:** “Kuro madem dikuxiya te çima dermanê kuxikê nedayê lê te dermanê ishalê dayê.”

**Berdestê wî:** “Mamoste wiha çêtir e, tu nabînî ji tirsa ku bi xwe de berde, nema diwêre bikuxe. Elah wekîl ev deh deqe ye wî qet negotiye kuxt.”



## Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Her wiha em dixwazin hûn jî ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rê bikin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.


**1-**Tiştek min heye
Di bin teştê de sê mirîşk
Dido sar
Yek jî germ
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Di devê wî de mar
Di nava wî de dûman
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
**1-**Yek tav, dido heyv û dinya
**2-** Tûtin, titûn

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Kok, dayik 5. Agir 7. Koma pez
8. Daçekek 9. Şemsiye, ban 13. Rengek
14. Alaveke mûzîkê 16. Ne nizim 19. Tarîx, mêjû
20. Noteke mûzîkê 21. Yek ji televizonên kurdî yên pêşî
22. Girtî, hêsîr 25. Ji bo 26. Bajarekî rojavayê kurdistanê
28. Safî, paqij

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Bandor, tesîr
2. Keç, an jî dikim (Bi dimilkî)
3. Sewaleke ku ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin
4. Sewaleke bar giran
6. Kesên ji Misirê
10. Bajarekî bakurê Kurdistanê
11. Aloz, tevlihev
12. Rengek
15. Wesayiteke deryayî ji bo bar û rêwiyan tê bikaranîn
17. Jêhatîbûn, biaqilî
18. Sewaleke ku misilman goştê wî heram dikin
20. Koka zimanê erebî û hin zimanên din
23. Kesên nikarin biaxifin
24. Lêborîn
27. Bersiva neyênî

Bersiva hefteya borî



# Û Peyre Tu Tişt Nema!

Kadîr Can

Piştî teqîna mezin divê biçûk-mezin cur bi cur gerstêrk çêdibin. Hemû zarokên dibistanê jî vê rastiyê dizanin. Wexta roketên atomê cihê xwe ji roketên Bliederê re dihêlin, girseyên mirovan bi awayekî tund ji gerstêrkên xwe difirin li fezayê belav dibin û navekî biriqî lê dikin û jê re dibêjin teqîna mezin. Bi vî awayî jî feza dikeve bin fermana mirovahiyê…

Gelek gerstêrk hene ku ji alıyê hêzên împarator ve hê ji nehatine kifşkirin. Ji bo serweriya împarotoriya mezin û tiwandar (xwedî qudret) hewce ye ku gerstêrkên bi vî awayî bên vedîtin. Çimkî împaratoriya qedirbilind ji kaosê aciz dibe. Gengaz e ku gerstêrkên hê jî nehatine keşfkirin di pêşerojê de ji bo împaratoriyê pirsgirêkan derbixe û wê aciz bike. Ji ber vê yekê jî hewce ye ku hêzên împaratoriyê gerstêrkên bi vî rengî kifş bikin û wan gerstêrkan jî tev li împaratoriyê bikin. Her wiha sefîrê Terranê ku bi dilsoziya xwe tê nasîn bi keştiya xwe ya fezayê dever bi dever digere û herî dawî gerstêrkekê dibîne û ji rayedarê keştiya xwe dixwaze ku keştiyê nizm bike. Lê dinêre ku cotkarekî kal li ser zeviyê dixebite. Sefîr fermana xwe dide û dibêje biçin û wî cotkarî bînin. Leşkerên keştiyê diçin lê dikin nakin cotkar qebûl nake û herî dawî jî dibêje TKXB û pey re leşker diçin vê rewşê ji sefîr re dibêjin. Sefîr jî dibêje dibe ku hûn rastî şerhişkekî hatibin. Û sefîr ji nû ve fermanê dide; tabûrek bila derkeve kifşê û rayedarên vê deverê kê be bînin ba min. Lê wexta ku leşker diçin ba kê nikarin bînin. Li ser navê împaratorê mezin diaxivin nabe, li ser navê sefîr diaxivin nabe. Keştiyeke mezin û qerase hatiye li ser erdê wan sekiniye kes paxa xwe pê nake. Matmayî dimînin lê ji destê wan tiştek naye.

Kurteçîroka Eric Frank Russel a bi navê “ Û Peyre Tu Tişt Nema” an jî “And Then There Were None” ji bo çîrokbêjiya zanista honaksaz mînakek gelek serkeftî ye. Mirov bi kêfxweşî dixwîne û zimanê Eric Frank Russel mirov nawestîne. Zimanê Russel îronîk e û zîrektiya wî nîşan dide. Russel îngilîz e û ew bi xwe kolonyalîzma Keyaniya Yekbûyî ya Brîtanyayê jî baş dinase. Russel di pirtûka xwe ya Û Peyre Tu Tişt Nema de kolonyalîzmê hinekî cuda digire dest. Bûyerekê dihone û mirovahiyê li fezayê belav dike. Împartorî jî dîsa rola xwe ya mêtinger dilîze û hewl dide ku girseyên mirovan ku li kîjan gerstêrkên fezayê belav bûne bîbîne û dîsa wan têxe di bin hukmê mêtingeriya xwe. Pirtûka wan a pîroz heye ku zagonên wan di vê pirtûkê de hatine nivisandin. Weke cîhana me ya îroyîn li vê derê jî mêtinger hem awayê leşkerî hem teknîkî gelek pêş ketine. Hêzên împartoriyê herî dawî gerstêrkek kifş dikin. Lê dikin nakin mirovên vê gerstêrkê ne bi wan re dipeyivin, ne jî bi gotinê wan dikin. Wexta ku leşker mirovên vî welatî didin ber zorê, gel ji leşkeran re dibêjin TLKXB… Hêzên Împarotoriyê di destpêkê de dibêjin qey TLKXB gotineke çort a vê deverê ye. Lê pey re hîn dibin ku mirovên vî welatê azad in û wexta ku kesek ji wan tiştên ku naxwazin bikin bixwaze ji wan re dibêjin “Tu Li Karê Xwe Binêre” an jî “TLKXB”. Hin bêhtir bidin zorê jî dibêjin, ez naxwazim vî karî bikim û dest bi berxwedana pasîf dikin.


Hêzên Împaratoriyê dikin nakin nikarin der barê vî welatî de agahî ji wan bigirin, hem jî nikarin rayedarekî bîbinin ku çavên wan bitirsînin. Çimkî rêveberî di vî welatî de tune ye. Her wiha kar û barên aboriyê jî di vî welatî de hinek cudatir dimeşe. Em dikarin bêjin bareya (birim) dirav “ber” e. Lê “ber” ne tiştekî şênber e. Weke mînak wexta ku cîranê te xaniyekî çêbike û tu jî ji vî karê fehm bikî tu diçî alikarî didi cîrane xwe û ev alîkirin jî ‘ber’ an jî berpirsiyarekê dixe ser milê cîranê te. Wexta ku karekî te yê ku cîranê te bikaribe bike jî derkeve cîranê tê ji ber vê “ber” ê tê çi ji destê wî/wê be dike. Wexta ku kesek ji bo karekî ku kêrî hemû civakê tê bike herî zêde ew “ber” an jî “berpirsiyarî” bi dest dixe û civak xwe ji ber vê yekê deyndar dibîne û alikarî dide karên wê/wî kesê/î. Kar û barên aboriyê di vî welatî de wiha dimeşe. Tu kes ji ber mecburiyetê tu tiştî nake. Deriyê wan tim vekiriye, tu car deriyê xwe qefle nakin. Ji wan a balkêştir di vî welatî de suc tune ye. Weke mînakekî neyînî tenê Jack heye.


Jack zexel û xemsar e karê xwe bi xelkê dide kirin û ji bo karê wan destê xwe navêje tu tiştekî. Di serî de gelê vê gerstêrkê dinêrin ku Jack xwe li stûyê wan dike bar êdî ji bo karên Jack alikariyê nadinê. Pey re dinêrin ku Jack dikeve mala wan û tişên wan didize. Ne zagonên wan hene ne jî girtîgehên wan. Yek bi yek her kes derê xwe qefle dike, kes bi Jack re xeber nade. Herî dawî Jack perîşan dîmîne. Ne dikare xwarinekê bixwe, ne dikare tu tiştekî bike. Çimkî kurmê darê naşikê û gelê vî welatî jî cezayê herî mezin dide Jack û berê xwe li Jack dizivirîne. Jack êdî neçar dîmîne û ji vî welatî derdikeve û diçe.

Gel jî dîsa deriyê xwe vedike û weke berê tevdigere. Hêzên Împaratoriyê ji bo kifşkirin û dagirikirina vê gerstêrkê hatine vê derê. Lê wexta ku çîrokên wan dibihîsîn, sekna wan a azad dibînin pir zêde di bin bandora mirovên vî welatî de dimînin û yek bi yek ji vê keştiyê diraccess evin û tev li wan mirovan dibin. Navê vî welatî Gand e û nav û pergala vî welatî jî ji Gandî ye. Herî dawî gelek leşker dev ji peywira xwe berdidin û tev li mirovên azad dibin. Û pey re lê dinêrin ku ne kolonyalîst ne jî tu kes nemane.

***Hevî dikim ku pirtûka Eric Franck Russelê ya “Û Peyre Tu Tişt Nema” an jî “And Then There Were None” em rojeke bi wergera kurdî jî bikaribin bixwînin. Hûn dikarin li ser lînka jêr pirtûkê bi zimanê orjînal bixwînin:***

***https://www.simpleliberty.org/research/and_then_there_were_none.htm***




# Gundikê Dono 'romaneke çîrokî'

Haştîvan Berkel

Ev pirtûk di sala 1988 de hatiye nivîsîn, gorbihişt M.Baksî di nava 76 rûpeline navîn de nivîsiye, sala 2007’an li Amedê di rêya weşanxaneya LÎS re hatiye weşandin.

Mijara pirtûkê li ser jiyaneke gundiyane û dewreke tevlîhev ya di navbera feodalîzm û kapîtalîzmê û desthilatiya dûkelê û axayan de ye, çîrokek evînî ku bi keser ,zor û sîtemê tê xemilandin û serîhildaneke ramiyarî ku du sê kes pê radibin û hewla hilweşandina sîstema feodal ya li wê deverê dikin, roman bi şêwenivîsa xwe ne kevnar (kilasîk) û ne jî nûjen e, wek gelek romanên kurdî yên beriya salên 2000 hatine nivîsîn ,kesayetên romanê (Aso keçeke gundî ,Bedo xortekî sêwî, evîndarê Asoyê ye, Zibêr aqilmendê êxeyeaxa-, Filîto gundiyekî ji gund hatiye derxistin û zavayê Zibêr e, Hecî Zorav xwediyê gundan yanî axe ye.

Bûyer bi piranî di navbera wan kesayetiyan de derbas dibe.

Nivîskar hewl dide ku rengdêriyê (wesf) têxe nava romanê û heta astekî biçûk bi ser dikeve lê mixabin xwendevên dide hesînê ku ew jî bi şermokîn hatiye hûnandin di nava refên romanê de, tenê di çend ciyan de wusa dike.

Mirov gava dixwîne pê dihese ku roman bi rengekî çîrokî hatiye hûnandin mînak; monolg(gotûbêj û gengeşeya di nav kesayetên romanê de) bi şêweyê çîrokbêjiyê hatiye hûnandin û tenê nivîskar wek çîrokbêj ji xwendevên re distre û vedibêje, wek mînak;

"Faro derbasî holê bû. Cixareyeke ji titûna kawêş paşa. Tiliyên wî dilerizin. Cixare li ser lêvên wî nedisekinî.

Asoyê dêya xwe qepaç kir. Serê xwe danî ser sînga dêya xwe û giriya.

Asoyê got: dadê, qurban dadê... hwd".


Serbestiya kesayet û lîstikvanên romanê tuneye, hatine dîl kirin ev jî yek ji pirsgirêkên vebêjiya bi şêweya çîrokbêjiyêye, pêwîst bû kesayet xwe bi xwe bi hevdû re bipeyiviyana û gengeşe bikirana, ne li ser zimanê romannivîs lê bervajî li ser zimanê kesayetan dê wusa kesayetên romanê jîndar bibûna û bi xwendevên bidana hesîn ku ew jîndar in û wî ji xwe biyan nedin xûyakirin.

Dîsa jî nivîskar dizane çawa xwendevên bi xwe ve girêde û ber bi bûyeran ve bikişîne, sazkirina hevokan li gor kurmanciyeke standard hatiye nivîsîn bi zarekî xweş û şêrîn peyv bi peyv li rêzan hatine rêzkirin, evînî, mêrxasî, dilsozî, delkbazî, sixûrî, sîtem, birçîbûn, sirgûnkirin û hwd, nivîskar li ser van stûnan hûnandiye ew jî nimûneyên civakî û rengîne ji civaka me kurdane ku heta dema îro jî ew tişt dibin ,lewma jî xwendevan xwe ji bûyerê dûr nabîne û berevajî bîtir pêde têye girêdan û bengî.

Dawiya bûyeran nivîskar daxwazekê û hêviyekê bi rengekî şîret dike û diqedîne romana xwe "Kuştina Hecî Zorav û Filîto zû belav bû... Zibêrê Ehmê di bin şikefta Zirqayê de berê xwe da çemê Xerzan û got:

_Ma Xwedêyo tu bi xwe dibînî ... Tu şahidê tarîxa me yî. Her tişt malûmê te ye. Em dîsa hatin serê lîstikê... Tarîxa Xerzan, nahêle ku hejmara Filîtoyan zêde bibe. Roja ku ev tişt bê cî, em ê pişta feleka xayîn bişikînin... hwd".

# Hejmara duyemîn a Kurdeçîrokê derket




Kovara Kurdeçîrokê her sê mehan carekê tê çapkirin. Hejmara kovarê ya duyemîn derket. Kurdeçîrok di vê hejmara xwe de jî bi çîrokên balkêş derdikeve hemberî xwînerên xwe û bala wan dikişîne ser çîrokên Kurmancî.

Di hejmara duyem ya Kurdeçîrokê de dîsa çîrokên kurdî û her wiha çîrokên nivîskarên biyanî yên wergerandî cih digirin.

Hejmara duyem a havîna 2021’ê bi edîtoriya çîroknivîs Mehmed Dîcle derket. Di vê hejmerê de jî çîrokên nivîskarên Kurd ên naskirî hene. Çîrokên nivîskarê îtalî Dino Buzzati û yê amerîkî William Faulkner jî hatine wergerandin û di kovarê de cih digirin.

Mehmed Dicle bi çîroka “Taxa Filan”, Hesen Ildiz “Derî Kete Cî”, Ferhadê Mihemed “Dengê Yasemînê”, Şener Ozmen “Nivîskarên Min Neman, Lê...” û Înan Eroglu jî “Bitcoin û Herdû Bazinên Bavê Min” di vê hejmarê de nivîsîne. ***AMED***

xwebûn

2-8 Tebax 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 85

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*
Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*
Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:*
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Kurdên cîhana dêrîn: hattî-hîtîtî 2



Keştiya Alalû
Agît Yazar



...Serê sibê zû, beriya roj hilê em radibin xurîniya xwe dikin û em berê xwe didin Hattûşaya efsanewî ya navgiran (nola dibêjin: nav ê giran e, war ê wêran e). Em di deriyê hêla rojava re, daxilî nava bajêr dibin. Pencê roj a nûhilatî jî ji hêla deriyê şêr ve davêje der. Tîrêjên rojê, mîna teriya teyrê tawis, li ser kavilê Hattûşayê belav dibe û me bi silava Xwedawenda rojê ya Arînayê di silavîne.

Paytext Hattûşa, li ber paleke bilind e û 4 km li rojhilatê navçeya Bogazkaleya Çorûmê dikeve. Her wiha li ser 40 hektar erdî hatiye avakirin. Sûra dora bajêr rapêçayî, 6-7 km dirêjahiya wê heye.

Paytext Hattûşa, ji du taxan pêk tê; taxa jêrîn û taxa jorîn. Li taxa jêr, perestegeh, sîloyên dexil, kevalxane/arşîv, avahiyên fermî yên rêvebiriyê û avahiyên jîngehî tê dîtin. Ev tax, di heman demê de cihê bazirgana, ango qada agora ye jî. Li vê taxê, hewzeke avê yê ji tahtekî yekpare kolayî heye. Gava kesên xerîb, yan jî bazirganên ji derve dihatin paytextê, ewil xwe di vê hewzê de pak û delal dişûştin vedişûştin, paşê derbasî nava gel dibûn. Dîsa li nêzî vê hewzê, kevirekî kesk yê giranît heye, ev kevirê hanê meriv metelmayî dihêle. Lewra pir xerîb dixuye. Heta hin kes dibêjin, ev kevirê fezayê ye. Ev kevirê hanê nola sabûnê hilû, ango dûz e.

Li taxa jor jî perestegeh, her wiha serayên keyayên hîtîtan û wekî din avahiyên cûr bi cûr tê dîtin. Gelemperî, avahiyên xwe li ser latên di serê kiriskirî avakirine. Li taxa jor, pênc deriyên têketina nava bajêr henin. Ev her pênc derî jî heta te bivê bi şox û şeng in. Navê wan deriyan ev in: Deriyê bişêr, deriyê bisfenks, deriyê di bin erdê de, deriyê bastîon û deriyê keya. Deriyê di bin erdê de, deriyê têketina nava çepken, ango tuneleke heye. Ev tunela hanê, ji bo bi dizî derketina derveyî bajêr e û ev deriyekî bixef e.

Jêrxaneya bajêr, ango binesazîya bajêr, bi hostahiyeke şarezayî hatiye avakirin. Hîn jî lûleyên kêzînê û lûleyên ava paqij tê dîtin.

Gava ez li nava kavilên paytext Hattûşayê digerim, ez wiha hîs dikim ku ez li gundekî, yan jî li bajarekî welatê xwe yê wêrankirî digerim; ewqas meriv hestiyar û dilzîzî dibe. Xwedêyo, ev çi hesteke seyr e! Gelo ev tiştên ez wiha hîs dikim, ev dejavû ye? Gelo ez di nava giyanên xeybanî de me? Ango ev cîhaneke paralel e?

Her tişt ji min re pir nas tê. Ne di destê min de ye; ez jixweber li ber dîwarê bîrovgirtî yê perestegeha Xwedawenda rojan a Arîna û yezdan Teşûp, temen dibim. Di heman demê de, meriv xwe di huzûra xwedê de hîs dike.

Nola dibêje: “Dîtin û gotin nabin yek.” Di asoya min de Hattûşa vedigere serdema xwe ya bi şoxeşeng a zêrînî û ji nû ve ava dibe. Ez jî dibim mîna dewrêşekî xeybanî û li kolan û gêdûkên Hattûşayê digerim.

Ez bi zarokên vê paytexta efsanewî re lîstika ço-pelê, veşartokê û hêlingokê dilîzim. Bi xortikên wê re çirrê, sêqûçê û holîyê(golfa kurda) dilizim. Bi evîndarên wê re, ji kulîlkên çolê sertacgulekê çêdikim. Ji destê jinên vê paytextê yên nanpêj, nan û xwarinên bi çêj dixwim. Li meclisa porsipî û rûsipîyên wê ya bi navê Meclîsa Pankûşê rûdinêm, li pend û şîretên wan guhdarî dikim. Li dîwana sazbend û dengbêjên wê, li ber qebeqeba dengê wan ê biraz, mîna şeraba di kewara qurmê dara mazî de danisilî be, wanî mest û sekan dibim. Her wiha bi şervanên wan re, hespê xwe dibezînim. Radikim cirîd û tiragê. Û li meqamê keyayên wê yên zîrek, ew çend jî şareza diqesidim; li wan merde-mêran diqesidim û piştê ji wan werdigirim. Xwe bi xwe ji xwe re dibêjim: “Ê de hema qaqibixo ji Rustemê Zal re jî!” Hasilîkelam, ez xwe ji malê dihesibînim; jixwe wanî ye jî. De fermo, xwendina xwe bikudîne! Heke we jî negot erê?

Di sedsala 19’an de, miletên Ewrûpayê di nava keftûlefta lêgerîna dîtina koka xwe de bûn. Meraq dikirin ka gelo koka zimanê wan di kûrahiya erda kîjan welatî de veşartî ye. Lema jî tu dereke ku wan xwe negihandê û nola gornebaşan venexepirand, nema. Digel lêgerîna koka xwe, hêjayiyên di bin erdê de veşartî jî, derdixistin û dibirin dikirin xemla muzexaneyên xwe yên bihişmet. Her wiha xwe digihandin razên cîhana dêrîn jî. Ev razên hanê, nola find û çirayê pêşeroja wan ronî dikirin.

Heta hingê, tenê navê hîtîtan di Ahîta Kevn û di nava nivîsên mîxî yên Misir, Babîl û Asûran de, derbas dibû. Lê cîhana zanistê a arkeolojiyê ji vê şaristaniyê re ne serwext bû.

Arkeologên Ewrûpayî, di destpêka sedsala 20’î de, bi hezaran kevalên kîl yên aydê hîtîtan, li paytext Hattûşayê dîtibûn. Kevalên hatibûn dîtin, ne tiştekî henekî bûn! Ew kevalên arşîva dewletekê, heta yê arşîva Împaratorekê bûn. Di nava wan kevalan de, ew ê di cîhanê de kevala peymana yekemîn ya di navbera du Împaratoran de hatibû girêdan jî bihata dîtin. Navê xwe yê eyan; kevala Peymana Qadeşê bû. Lê kesekî vî zimanê bi nivîsa mîxî hatibû nivîsîn, nizanîbû ji hev derxista. Jihevnederxistina vî zimanê nepen, bûbû kuleke heftşaxê û xwe berdabû li ser dilên wan.

Di encama kolandinên arkeolojîyê de, digel wan kevalan, gelek berhemên niwaze yên din jî derdiket li ber ronahiya rojê. Berhemin ew çend niwaze bûn, meriv ji xwe re fedî dikir li wan bineriya.

Berpirsên tîma kolandinê, li ber pirbûn û niwazeya berhemên dihatin dîtin, ketibûn tev. Nizanîbûn çi xweliyê li serê xwe bikin û çawa vê tevliheviyê ji hev veçirîne. Lê, ger benîademî li mirîşkê biritibîne, ew ê bi zorê hêkê jê derxîne! Wekî din gotineke pêşiyan yeka din jî heye, dibêjin: “Ger şivan bixwaze, dikare şîr ji nêrî bidoşe.”

Zimanzanê Çekyayî, yê bi navê Bedrich Hrozny jî wanî kir. Di sala 1915’an de ev hevoka bi zimanê hîtîtî ji hevdu verşand: “Nînnda-an ezzatenî watarra ekûtten.”

Wergera wê ya bi kurdiya îroj, wiha ye: “Nan bixwe, avê vexwe.”

Wergera vê hevokê, serdemeke nû vekir. Heke baskên lêkolînerên hingê hebûna, ew ê ji şahiyan bifiriyana. Lewra, hate kifşkirin ku ev zimanê hanê, zimanê Hînd-Ewrûpa yê herî kevn e ku pê hatiye nivîsandin. (Lê heke tu ji min bipirse, zimanê Hînd-Ewrûpî yê herî kevn pê hatiye nivîsandin, kevalê Kûrtî/Xorrî ye. Tenê min xwest ez vê çewtiyê bi bîra kesên miraqdar bixînim)

Wergerandina vê hevokê, di cîhana zimanzanan de bû dingiyan. Kelecan, coş û peroşeke kesnedîtî deng veda. Raza hezaran kevalên arşîvkirî, yek bi yek ji hev hatin verşandin û veçirrandin. Konê tariyê yê 3 hezar 800 sal berê, ji ser vê şaristaniya qebqebe hat rakirin.

Ez dixwazim dîsa li hevoka "Nînndaan ezzatenî watarra ekûtten" vegerim û hinekî li ser hûr bibim. Her wekî min li jor jî destnîşan kiriye, ev hevoka hanê bi nan dest pê dike û bi av-vexwarinê bi dawî dibe. Qalibê hevoksaziya vê hevokê, peyv bi peyv li gorî rastnivîsa kurdiya me ya îroj e ku em bi kar tînin e. Wekî din jî ya gelekî gelekî girîng, ev hevok bi peyveke bingehîn ya kurdî dest pê dike: NAN! Bavo, bavo, bavo! Ne tiştekî din jî, êdî NAN?! Ev peyveke ewçend girîng û pîroz e, di nava xwarinvexwarina benîademiyan de, piştî şîrê dayikê, NAN pîroz û bimbarek e. Bi hîtîtî jî, bi somerî jî û bi kurdî jî, hevîrê li tenûrê dikeve, yaxud li ser sêlê, an jî li ser kevirê sincirandî tê pijandin, navê xwe NAN e!

Ev make-peyva zêrîn, mîna zemqa debûşê zimanê somerî, hîtîtî û kurdî bi heve dizeliqîne. Ne tenê ev peyv, ez dixwazim çend peyvên din yên hîtîtî û kurdî bidim li ber hev: bi hîtîtî, pae/bi kurdî, pê-ling. Mû/mi-ez. Ta/Tu. Gestûg/Guh. Nû/Û. Tîa/Têyî(jibo hatinê). Gûd/Ga. Maş/Meş. Sûppî/Sipî(rengê sipî). Kûer/Kêr. Hastayî/Hestî. Sara/Serî. Mûrrî/Tirî. Paxhîrî/Agir. Şiwat/Şewat. Hink/Hinek. Harî/Here. Sale/Sal. Ebanî/Banî-jor. Harî/Here. Zarî/Zarok. Zik/Zik. Tiûa/Tav-roj. Hûrdar/Şûrdarşervan. Û gelek peyvên din...

Va ye ji we ve jî eyan e; ez naxwazim peyvên xwerû bi kurdî, dîsa bi ravekirineke kurdî rave bikim. Lewra ev dibe nola meriv ji bo rojê bi yekî bide hînkirin, meriv wêneyê rojê bixêzîne. Lê dîsa jî dilê meriv nekeve cî û meriv li binê wêneyê rojê bi nivîskî binivîse, bibêje: “Binerin ev roj e ha!”

Bi sedan peyvên hîtîtî û kurdî wekî hev henin. Lê min nexwest ez zêde dirêj bikim. Heta ev peyvên min li jorê danîn li ber hev, heman pey gelek ji wan bi zimanê somerî, xorrî-kûrrî û ûrartûyî jî tên heman wateyê.

Êêê. Tabî ev rastiya hanê, dagirkeran diqutifîne û zirav li wan diqetîne. Bila bikin zirrezir bilerizin û bibizdin! Lewra înkarker yên dikin nakin nikarin xwe bi şaristaniyeke paqij ve bizeliqîne, li hember esaleta miletê kurd, nola qemûşkê dicivin li ser hev; xwe bênirx, bê kok û erzan dibînin. Ma ew jî vê esaleta me ya bihişmet netirsin, ew ê ji kêbitirsin gelo?

***(Dê bidome)***





